# JI BINGEHÊN RÊZIMANA KURDÎ

((Pirtûka Fêrkirinê))

**Amadekar**
**Dr. Mihemed. E. ELÎ**

**Çapa Yekem – 2006**

# JI BINGEHÊN

# RÊZIMANA KURDÎ

**((Pirtûka Fêrkirinê))**

**Amadekar**

**Dr. Mihemed Ebdo ELÎ**

**Çapa Yekem – 2006-**

*Diyarî…*

*Ji bo*

*Mîrê rêzimana Kurdî…*

*Mîrê gewre*

# CELADET BEDIRXAN

*Mihemed Ebdo Elî*

# Pêşgotin

Li sala 2000an, min û her du hevalên xwe Dr.Kamîran Bêkes û Mamoste Can, pirtûkeke rêzimên bi navê (Rêzimana Kurdî) amade kir, mebesta me jê ew bû, ku bibe pîrtûkeke fêrkirina rêzimana Kurdî, lê gava ku ew pirtûk dakete warê kar, me dît ku bi xwendevan giran e. Lewre, û li ser daxweza hevalan, min ev pîrtûk amade kir, hêviya min ew e, ku bi kêrî mebesta hînkirina zimên were.

Ev pîrtûk li ser bingeha pîrtûka me ya berê ya bi navê ((Rêzimana Kurdî)) hatiye avakirin. Min hin mijar jê hilanîn, hin kurt kirin û hinek jî fireh kirin, û careke din jî li çavkaniyên rêzimên yên sereke vegerîm, min xwest tiştên tewir girîng û pêwîst ji rêzimên bi xwendevanan bidim nasîin.

Û ji bo ku rêziman baş were têgihiştin, min li ser her mijarekê spartinek danî, da ku xwendevan li mal li waneya xwe veger û kardyînê bike.

Ji bilî wê, me li ser her mijareke rêzmanî, deqeke vebjartî, çend hînker û rahênan jî danîn, armanc jê ew e, ku xwendevan hînî xwendin û nivîsandina rast û durust bibe û tiştê ku di naveroka her wanekê de hatiye, baştir were têgihêştin û zanîn. Em ji nivîskarên xudiyên wan deqan lêborinê dixwezin, ji ber ku, ji bo deq li bejina mijara waneyê were, me

maf da xwe, ku em henek guhêrtinê biçûk tê de bikin.

Û da ku ji xwendevanan re hêsan bikim, me ferhengokeke biçûk ji hinek bêjeyên ku di pirtûkê de hatine, li paş danî, em hêvîdar in ew jî sûdar be.

Li dawiyê spas ji her du Mamosteyan re, Mihidîn Şêx Alî û Kemal Ebdalo wekî ku xwendina berî çapê ji pirtûkê re kirin.

**Mihemed. E. Elî**
**Efrîn- 2006 –**

# ELFEBEYA KURDÎ

Elfebeya kurdî, ji sî û yek tîpan pêk tê. Ew li gor durvê nivîsandin û dengdanê bi du şêweyan parve dibin:

- Li gor **DURVÊ NIVÎSANDINÊ:**

Tîp du cure ne:

**1. GIRDEK : A, B, C ….**

**2. HÛREK : a, b, c ….**

**Aa - B b - C c - Ç ç - D d - Ee - Ê ê - F f - G g - H h - Ii - Î î - J j - K k - L l - Mm - N n - Oo - P p - Q q - R r - S s - Ş ş - T t - U u - Û û - Vv - W w - X x - Y y - Z z .**

Tîpên girdek di rewşên jêrîn de bikar tên:

1. Di destpêka hevokê de :

**Îro sar e. Bihar xweş e.**

2. Tîpa pêşîn ya serenavekî :

**Dilêr, Xabûr, Ararat, Serê Kaniyê.**

3. Dema mirov ji bo balkêşiyê bixwaze peyvekê yan hevokekê berçav bike, dikare bi tîpên girdek binivîse:

**Ji AZADIYÊ bi rûmetir tiştek nîne.**

4. Navên cejnan, mehan, rojan, xaknîgarî, pîroz..:

**Gulan, Newroz , Xweda…**

5. Navên rojname û kovaran:

**Rojnama *Newroz*, kovara *Gulistan*.**

6. Piştî xal, cotxal, pirsnîşank û matnîşankan:

**Li hevalê xwe nihêrî û got: *Tu* rast hevalî.**

**Mirovo ! *Tu* çima wilo dikî ?.**

7. Kurtkirin:

***NY* (Neteweyên Yekbûyî). *BZ* (berî zayînê)**

- Ji aliyê **DENGDANÊ** ve:

Tîpên Kurdî parve du koman dibin:

**a. Tîpên dengdêr :** Deng ji wan dertên. Ew heşt in. ji wan:

**-** Pênc dengdirêj in :

**A** : Av. **Ê** : Êş. **Î** : În. **O** : Ol. **Û** : Rûn.

**-** Sisê dengkin in :

**E** : Ez. **I** : Dil. **U** : Du.

**b. Tîpên dengdar :** Bê alîkariya dengdêran deng jê bi dernetên. Ew bîst û sisê ne.

Jê pênc **CÊWÎDENG** in, yanê her yek du dengan bi derdixe: *Sert û nerm*. Ew jî ev in: **Ç - K - P - T - R.**

- Dengê **NERM:**

**<u>Ç</u>av – <u>K</u>al – <u>P</u>oz – <u>T</u>er – Şê<u>r</u> .**

-Dengê **SERT** :

**<u>Ç</u>ar – <u>K</u>ort – <u>P</u>ir – <u>T</u>êr – <u>R</u>ik.**

- **Taybetmendiya hin tîpan :**

***A.*** Du tîpên dengdêr di bêjeyekê de nagihên hev, gava gihan hev jî:

**-** Yan dengdara girêkok (Y) dikeve navbera wan, û wan bi hev ve girê dide.

**Mase + ek … Maseyek**

**-** Yan dengdêrek dikeve û yek dimîne.

**Mase + ek … Masek**

**-** Yan jî her du tîp bi dengdêreke din tên guhertin: **Mase + ek … Masak**

***B.*** Eger tîpên dengdêr (ê) û (î) li pêş tîpa dengdar (Y) hatin, bi dengdêra (i) tên guhertin.

**Rê + ya … Riya min**

**Mî + ya … Miya Şivên.**

***C.*** Eger tîpên dengdêr (û) û (u) li pêş tîpa dengdar (W) werin, gengazî heye bi tîpa dengdêr (i) bên guhertin.

**Dû + wê … Diwê pixarê**

**Du + emîn … Diwemîn(duyemîn)**

***D.*** Du tîpên dengdar ên mîna hev li dû hev netên, eger hatin jî, yek ji wan tê avêtin.

**Rast + tir … Rastir**

**Paş + şîv … Paşîv**

# CELADET BEDIRXAN
# hîmdarê Elfebêya Latînî ya Kurdî[1]

Di destpêka sedsala bîstan de, bayê rizgariya netewan li Rojhilata Navîn dida, di jiyana gelê Kurd de jî gupikên hesta netewî dibişkivîn. Li ber pêşrewên pêşîn ji rewşenbîrên Kurd, pirsa amadekirina Elfebiyeke nû ji zimanê Kurdî re derdiket meydanê.

Di sala 1913 an de, Rêxistina Vejîna Kurd, nûnerê xwe Ebdilrezaq Bedirxan dişînin bajarê Pêtersburgê li Rûsiyayê, da Elfebiyeke Kurdî dîne. Li wir ew raste zanyarê Ermenî Î.Orbîlî tê, û li gor fermana şaliyarê Rûsî yê karê derve, ew Elfebiyekê li ser bingeha tîpên Ermenî û paşê ya Rûsî datînin, lê herdiwan cihê xwe di nivîsandina Kurdî de ne girtin.

Ji hêleka din ve, hîn dema C. Bedirxan li Istenbûlê şagirtê dibistanê bû, pirsa Elfebêya Kurdî ew dikişand. Ji ber ku wî didît Elfebêya

---

[1] . Bi kurtahî ji pirtûka : ((Raperîna çanda Kurdî di Kovaera Hawarê de))- Dr. HUSÊN HEBEŞ.

Erebî dengina dide, di xwendinê de netên nivîsandin, ev jî ji zimanê Kurdî re pirsgirêkeke mezin bû.

Mîr Celadet di sala 1919 an de bi Mêcer: E. Noel re diçe Kurdistanê, E.Noel xwe hîn Kurmancî dikir, Celadet jî kelepûra Kurdî ya devkî dinivîsî. Lêbelê gava ew û hevalê xwe li tiştên ku dinivîsandin vedigerîn, Celadet didît, Noelê ku bi Latînî dinivîsî , bê dijwarî dixwîne, lê Celadet bi dijwarî destnivîsên ku bi tîpên Erebî nivîsî bûn dixwîne. Bersiva vê pirsê diyar bû; pirsgirêk di tîpan de bû, C. Bedirxan dibêje (( *Wê hîngê min di cih de qirara xwe da, û ji xwe re bi herfên Latînî elfebiyeke lêkanî* )).

Gava C. Bedirxan vedigere Istenbûlê, Elfebêke ji 36 tîpan datîne û pê pirtûkekê dinivîse, lê mixabin, destlata Tirkiyê wan digire û Mîr Celadet jî sirgûn dike. Paşê, piştî ku li Şamê bi hin zanayên Kurd dişêwire, Mîr berî sê tîpan û paşê jî diduyên din ji Elfebêya xwe davêje, li encamê li ser (31) tîpan dimîne, û pê kovara Hawarê bi derdixe.

Gava Mîr C.B Elfebêya Kurdî ya nû datanî. Wî ev silogan ji xwe re kiri bû armanceke sereke:

*DI HER TIŞTÎ DE YEKÎTÎ.*

Û digot : *YEKÎTIYA MILETÊ KURD BI YEKÎTIYA ZIMANÊ KURDÎ TÊTE PÊ, Û DI YEKÎTIYA ZIMÊN DE GAVA PÊŞÎN YEKÎTIYA TÎPAN E.*

**RAHÊNAN li ser deqê**

1. *Çend bêjeyên ku bi tîpên girdek dest pê bûne destnîşan bike, û xuyan bike çima girdek hatine bikaranîn ?*
2. *Çend nimûneyan li ser guhertina tîpên dengdêr û* xebitandina tîpa girêkok (Y), yan tîpa (W) di navbera du dengdêran *xuya bike*.
3. *Çend nimûnan li ser destnîşan bike.*
4. *Wateyên van bêjeyan nas bike û li ezber bike:*

**Raman, silogan, sereke, kovar, destlat, mixabin, dijwarî, kelepûr, pêşrew, şaliyar, encam, amadekirin.**

**SPARTIN**

Van pirsan bibe deftera xwe û bersivan bide:

*1. Di van bêjeyan de, tîpên ( hûrek an girdek ) sererast bike:*

**azAd ……………, Çemê efrînê…………………,**

**Gurê har ……………, lozan ………**

*2. Van valahiyan bi bêjeyên rast dagire:*

**-Tîpên zimanê Kurdî………. in, jê………… dengdar in, û heşt…………… in.**

**- Ji tîpên dengdar ………cêwîdeng in, carina dengê ………… , û carina dengê ………… didin. Ew tîp jî ev in: ……………**

*3. Tîpên cêwîdeng ên nerm bi(N) û sert bi (S) di destpêka van bêjeyan de destnîşan bike:*

**Çarçira…………, rûmet…………, perzer……… , poz……… , karker ………… , têr… ……, tîr……….**

*4. Dengdêrên kin bi (K) û yên dirêj bi (D) di bêjeyên jêrin de destnîşan bike:*

**Roj………, welat…………, rastî …………, rûn……**

*5. Vekîta rast ( R ) li ber dîne,û ya çewt jî serast bike:*

**Rûyê ……… geş , Yekîtîya …………… Netewan, riya ……… dirêj.**

*6. Şêweyên nivîsandina van bêjeyan bide nasîn:*

**Kanî+ek :** **Tene + ek :**

**Çiya + ên :**

# KÎT Û BÊJE

## KÎT

**KÎT**: Beşê bêjeyê ye ku bi yek carê ji devê mirov derdikeve. Tîpek dengdêr dikane bi serê xwe, yan ligel tîpekê yan çend tîpên dengdar kîtekê çêke. Lê tîpên dengdar bê dengdêran nabin kît.

- **Cureyên kîtan**

- Ji dengdêrekê : a, ê, û…
- Ji dengdêr û dengdarekê : ez, ba, av, aşê
- Ji dengdêrekê û du dengdaran : dev, par, kar
- Ji dengdêrekê û sê dengdaran : qenc, deng
- Ji dengdêrekê û çar dengdaran : stran, stand

# BÊJE

**BÊJE**: Peyveke serbixwe ye, ji kîtekê yan bêtir pêk tê, û wateyeke serbixwe dide.

- **Cureyên bêjeyan**

Ji aliyê **BINESAZIYÊ** ve, bêje di zimanê kurdî de, çar cure ne:

## 1. Bêjeya sade

**Wekî: Mirov , welat , hatin , çû.**

Mirov nikane bêjeya sade ji hev bike, ji ber ku her kîtek bi tena xwe ti wateyê nade.

## 2. Bêjeya pêkhatî

Ew ji bêjeyeke sade û ji hinek pirtik tê darijtin. Pirtik jî du cure ne:

- Pêrkît ( *bi pêşiya bêjeyê dikevin* ) :

**<u>Ve</u> + xwarin … <u>Ve</u>xwarin**

**<u>Hil</u> + dan … <u>Hil</u>dan**

**<u>Ber</u> + bang … <u>Ber</u>bang**

- Parkît ( *bi paşiya bêjeyê dikevin* ) :

**Azad + <u>Î</u> … Azad<u>î</u>**

**Dil + dar … Dildar**

**Xwende + van … Xwendevan**

**a.** Darijtina bêjeyan bi alîkariya **PÊRKÎTAN.**

**PÊRKÎTÊN** sereke ev in :

**Vekirin, hilkirin, berdan, rakirin, rêkirin, vêxistin, dadan, rûxistin, badan, heraftin, wergerandin, bêkar, neyar, sersal, bindest, navsal.**

**b.** Darijtina bêjeyan bi alîkariya **PARKÎTAN**.

**PARKÎTÊN** sereke ev in :

- Parkîtên BIÇÛKER

  **Mêrik, fedok, germişk, zirtone, tirsonek, kerole, perçe.**

- Parkîtên navê LÛSÊ

  **Havîngeh, Kurdistan, nexweşxane, hêlîn.**

- Parkîtên navê ALAVÊ

  **Birek , bêjing , çaydan , bihîstok.**

- Parkîtên RENGDÊRAN

  **Zana, delal, bîrawer, gunehbar, gewre, belengaz, xuhsar, ronak, gilover, mêrane, virek, Kabcî, hişmend, bendewar, bextyar, çavdêr, sazbend, malsaz, canbaz, xebatkar, nêçîrvan, bîrewer, lezgîn, aldar.**

- Parkîtên ENDAMTIYÊ

**Gundî, arîn, perwîn.**

- Parkîtên RAYÊN LÊKERAN

**Tîravêj, dengbêj, alîgir, mêrkuj, desmal, welatparêz**

- Parkîtên HOKERÎ

**Aştiyane, çargoşe, hêvarkî .**

- Parkîtên bêjeyên RAZBER:

**Germayî, hevaltî, azadî, piranî.**

## 3. Bêjeya hevdudanî

Bêjeya hevdudanî yan ji pevgirêdana du bêjeyên sade, yan jî ji ducarkirina bêjeyekê pêk tê.

**Tîr + kevan … Tîrkevan**

**Rast + rast … Rasterast**

### a. Pevgirêdana du bêjeyan

Bêjen hene dikanin bi hev ve werin girêdan, û bêjeyeke din e nû çêkin:

- DU NAVDÊR:

**Arav, destbira, dotmam, dêlegur, rêhesin, bakur.**

- NAVDÊREK û RENGDÊRK:

**Baldirêj, çavreş, şevereş, bextreş, sorgul, pîrjin, xweşmêr, xuşav.**

- *DU LÊKER yan LÊKEREK û BÊJEKÊ:*

**Kirînfirotan, danûstandin, mêrkirin, jinanîn, reşkirin, rindkirin.**

- HOKER:

**Ber : Berbang, berbext.** **Bin : Bindest, binçeng.**

**Der : Derbûn , derkirin.** **Î : îsal, îşev.**

**Paş : Paşeroj, paşber.** **Nav : Navdar, navkêl.**

**Dû : Dûmahîk , dûketin.** **Pişt : Piştvala , piştgirtin.**

**Ser : Serdar, serefiraz.**

-JIMARNAV û BÊJEKÊ:

**Nîv : Nîvro, nîvtijî.** **Çar : Çarpêç, çargoşe.**

**Du : Durû , dumil.** **Sê : Sêkoşe, sêling.**

**Yek : yekdeng, yekgirtin.**

- CINAV û BÊJEKÊ :

**Jê : Jêkirin, jêhatî.**

**Tev (têk): Tevdan.**

**Lê : Lêdan, lêxistin.**

**Hev : Hevber , hevreng.**

**Pê (Pey): Pêma, peydakirin.**

**Pev : Pevketin, pevxistin.**

**Xwe: Xwefiroş, xweza.**

**Tê (di wî, wê) : Têxistin, têdan.**

**Pê (bi wî, wê) : Pêgirtin, pêdadan.**

**Lihev/lev : Levxistin, levkirin.**

- DAÇEK û BÊJEKÊ :

**Bi : Bicih , bigoşt.**

**b. Ducarkirina bêjeyekê**

Bi ducarkirina bêjeyekê bêjeke hevdudanî tê çêkirin :

Nalenal, rasterast, beraber, rengareng, koyeko.

**Têbîn:**

Di hin bêjeyên hevdudanî de, ji bo ku gelek dengdar li pey hev netên, dengdêrek (e, a, û) her du bêjeyan bi hev ve girê dide û bilêvkirinê hêsan dike. Ji wê tîpê re tîpa girêkok tê gotin.

Rengareng (a). Keskesor (e). Kisbûkar (û).

**4. Bêjeyên bargiranî:**

Bêjeyên bargiranî ji du hêmanan bêtir çêdibin:

**Bindestî, berçavik, binavkirin, liberxweketin.**

Di zimanê Kurdî de, hîn tu rêzik taybet ji sazkirina bêjeyên bargiranî re nehatine danîn.

# EVÎNA ZIMÊN EVÎNA WELÊT E[1]

Her miletek xwediyê mafê jînê û azadiyê ye. Lê hin ji wan, ji vî mafê bingehîn bêpar mane û bindest dijîn. Bindestiya miletekî, pirîcar, ji kêmasiya yekîtiya wî, ji paşdemayîna wî ya çandî û zanistî û ji qelsahiya wî ya leşkerî tê.

Bindestî, dagîrkirin û qelsahî ji bo miletekî derdpêketineke mezin e. Lê derdê hîn mestir ew e, ku endamên miletekî li hemberî zimanê xwe, çanda xwe, wêbêya xwe bêxem û dilsar bimînin. Gelê ku li çanda xwe xwedî dernekeve mîna dara ku kok û rîşeyên wê hew têne avdan, ji hev dikeve, dirize, winda dibe.

Ziman dilê çandê yê jîndar e, hîmê zanava neteweyî ye. Ziman nêrevanê şehrezayî û bajarvaniya miletekî ye, neynika giyan û bîra wî ye. Sermiyanê wî yê dîrokî ye. Hezkirina miletekî, bi hezkirina zimanê wî dest pê dike. Evîna zimên, evîna gel e,evîna welêt e.

---

1. KENDAL NEZAN, kovara Hêvî, Hejmar (1)-1983

Em hemî dizanin ku îro zimanê Kurdî di tehlûkê de ye. Zimanên resmî -Tirkî, Erebî, Farisî- bi riya xwendegeh, radyo û televîzyonan êdî ketine bajarok û gundên welatê me. Koça gundiyên Kurd ber bi bajarên mezin, ên ku navendên çandên serdest in diçe. Siyaseta bêgidî ya dewletên ku dest danîne ser welatê me, dixwazin bi hemû awayan rêç û şopa kurdîtiyê, çanda Kurdî ji rûyê zemînê rakin. Veguhêrînên civakî, dikin ku roj bi roj peyvandina Kurdî di nav neslên nû de paş ve biçe.

Îro em ketine rewşeke wilo ku pirîcar hêzên welatparêzên Kurd, têkoşerên Kurd, di civînên xwe de, di nav hev de, bi zimanên din dipeyîvin û dinivîsin û zaroyên xwe hînî zimanê Kurdî nakin. Zimanê ku ji bav û kalên xwe fêr bûne, neghandine nifşên nû. Hin welatiyên me bi salan li derveyî welêt mane, çend zimanên Ewrupayî hîn bûne, lê serê xwe ne êşandine ku zimanê xwe yê dê jî hîn bibin.

Ev meşa han, ku pêşî lê nayê girtin, dikare di nav 40-50 salî de, me têxe rewşeke wiha kambax, ango : *Neteweyeke bê dewlet, bindest , bêxwedî û bê zar û ziman, mehkûm e ji rûpelên dîrokê winda bibe.*

Stubariya dîrokî û bi lez a hemû ronakbîr û mirovê Kurd e, ku li zimanê xwe xwedî derkevin, wî biparêzin û pêş ve bibin, di pêwendî û danûstandinên xwe yên devkî û nivîskî de bikar wînin,  û rûmetê bidin ziman û kurdîtiya xwe.

**RAHÊNAN li ser deqê**

*1. Li ser her cureke kîtan nimûnakê derîne.*

*2. Çend nimûnan li ser her cureke bêjeyê destnîşan bike.*

*3. Wateyên van bêjeyan nas bike û li ezber bike:*

**Kambax, pêwendî, rûmet, stubarî, netewe, fêrbûn, şehrezayî, bajarvanî, sermiyan, jîndar, endam.**

**SPARTIN**

*1. Van bêjeyan kît bi kît binivîse:*

**Daristan………,tu……,      jihevhezkirin…………**

**Dixwend………, birêketama………,  Agir……….**

*2.Ji bêjeyên jêrîn, ên sade (S), ên pêkhatî (P), ên hevdudanî ( H) û yên bargiranî (B) li ber dîne.*

**Hat( ), rûniştin( ), biserneketin( ), tembûrvan ( ), dilsozî ( ), hawar( ), vegijgijandin( ), dengbêj ( ), lihevrûniştin ( ).**

*3.Pênc pêrkîtan bijimêre û du bêjeyan li ser her yekê bide .*

*4. Pênc parkîtan bijimêre û du bêjeyan li ser her yekê bide.*

*5. Du bêjeyên hevdudanî binivîse.*

# NAVDÊR

**Navdêr**: Bêjek e bi kêrî binavkirina tişt, kes, lawir û ramanan tê.

- ## Cureyên navdêran

***A.*** Ji aliyê **WATEYÊ** ve, du cure navdêran hene:

**a**. Navên **BERNAS (SERENAV)** : Ew mirovekî yan tiştekî bi tenê destnîşan dikin. Ew bi girdekan dest pê dibin. Beşên navên bernas ev in:

- Navên **rast** : Navên mirovan, cejnan…

**Azad, Newroz....**

- Navên **malbat** , êl, netew û xaknîgariyê :

**Berazî, Amkî, Kurd, Ereb, Kurdax, Sîpan….**

**b.** Navên **CELEBAN (HEVENAV)** : Celebekî didin nasîn, ew jî parve du beşan dibin:

- Navên **şênber** : Navên tiştên berçav , ên têne dîtin û parmistin:

**Çiya, dar, mirov, ba, germ…**

- Navên **razber** : Navên tiştên bi raman û hiş têne zanîn û nas kirin:

**Hest, raman, azadî…**

***B.*** Ji aliyê **BINESAZIYÊ** ve, navdêr sê bir in:

- Navdêrên **sade** : **Dest, çav, masî.**

- Navdêrên **pêkhatî,** ji bêje û pirtikekê pêk tên:

**Destek, çavdêr.**

- Navdêrên **hevdudanî** : **Kerguh, marmasî.**

*{Ji bo naskirineke bêtir, li wana bêjeyê vegere}.*

- **Zayenda navdêran**

Di kurmancî de du zayend hene, **NÊRZA** û **MÊZA.**

***A*. Zayenda nêr**

Li ba Kurdan, ji bilî hin awartan, navdêrên jêrin nêr in:

- Giyanewerên nêr.
- Endamên laşê giyaneweran ên derve.
- Tiştên negiyanewer yên beloq û bilind.
- Berhemên lawiran.
- Ezman û ba.
- Navên hesinan û rengan.
- Çekên lixwekirinê.
- Darên hişk û birî.
- Jimarnav ji bilî jimar (yek).

***B*** **. Zayenda mê**

Di Kurdî de navdêrên jêrin mê ne:

- Giyanewerên mê.
- Endamên laşê giyaneweran yên hundir ji bil dil.
- Tiştên kolandî, qul û dûz.
- Cîwar.
- Çekên şer ji bilî şûr.
- Bêjeyên raderî.
- Darên ter û li dar.
- Rêxistin û sazî.
- -Alavên navgîniyê.
- Serenavên xaknîgarî .
- Tiştên ku li esmên in, û tiştên ku ji esmên tên.
- Yên navên çaxê dinimûnin.
- Nexweşî û birîn.
- Şîv, xwarinên kelandî, û navên firaxên xwarinê.
- Alavên mûzîkê û tiştên nivîsandinê.
- Bêjeyên razber yên pêkhatî.
- Bi gelemperî, bêjeyên ku em nikanin bi şêweyekî xwezayî zayenda wan nas bikin

û mîna navdêran bi kar tên, wek: Navên tîpan, hoker, cinav...

- **Mêjera navdêran**

Jimara navdêran bi serê xwe ne xuyaye. Ew bi alîkariya: Lêker, tewang, veqetandek, parkîtên nependiyê, rengdêrên jimarîn û bangê xuya dibe.

| | *Y.Jimar* | *G.Jimar* |
|---|---|---|
| ***Lêker :*** | **Şivan hat** | **Şivan hatin.** |
| ***Veqetandek :*** | **Şivanê jîr** | **Şivanên jîr.** |
| ***Tewang :*** | **Şivên got** | **Şivanan got.** |
| ***Bang* :** | **Şivano** | **Şivanino .** |
| ***Parkîtên nependiyê :*** | **Mirovek** | **Mirovin .** |
| ***Rengdêrên jimarînê :*** | **Yek mirov.** | **Pênc mirov.** |

- **Bîna û nebîna(**binavkirin û nebinavkirinê) **di navdêran de**

Her naveke bi serê xwe bîna ye. Lê gava navdêr nebîna be, alava nependiyê bi wî dikeve, alav jî ev in:

**Ek** : Ji yekejmara her du zayendan re.

**Xortek , Keçek**

**In** : Ji gelejmara her du zayendan re.

**Xortin , keçin.**

# PIRSA KURD Û KURDISTANÊ DI PEYMANA SÊVRÊ DE[1]

Di şerê cihanê yê yekê de, dewleta Osmanî di şêr de , bi dewleta Aleman re HEVALBEND bû. Di encama şer de Aleman û hevalbendên wê têkçûn, û dewletên HEVKAR Firansa, Emerîka Yekbûyî (EY), Îngilîz û Italiya bi ser ketin.

Dewletên hevkar bi dewleta Osmanî re, di roja 10ê Tebaxa 1920an de, li bajarê Sêvrê peymanek mor kirin. Li gor wê peymanê tixûbên dewleta Osmanî ji nû ve hatin kişandin.

Ya herî girîng di peymanê de ew bû, ku Kurdistan -ku ne bitemamî bû jî- di çarçewa navnetewî de wek welatekî bi serê xwe hate pejirandin. Lê nûnerên Kurdan bi serokatiya Şerîf Paşa di guftûgoyan de mîna aliyekî serbixwe ne hat vexwandin û pejirandin.

Di peymanê de, sê xal li ser Kurd û Kurdistanê bûn. Ew xal bi kurtahî wiha bûn :

---

1. Ji pirtûka: Dîroka Kurd û Kurdistan - AMED TÎGRÎS, ASO GERMIYANî.

**1**. Dê ji aliyê deweletên hevkar ve, desteyek were avakirin, ev desteya di nav şeş mihan de, ji Rojhilatê çemê Ferêt de, ra tixûbên Ermenistanê û Sûriyê, çiqas Kurd hene, dê hejimara wan bê çespandin. Û li gor rewşê ji bo Kurdan di wê herêmê de, otonomiyek bête damezrandin.

**2**. Dema desteyê kar û barê xwe durust kir û biryar da, pêwîste, dewleta Osmanî di nav sê mehan de, biryara otonomiyê bi cih bîne.

**3**. Eger netewa Kurd bixwaze di nav salekê de ji dewleta Osmanî cihê bibe û dewleteke serbixwe ava bike, pêwîste Kurd daxwaza xwe wînin Koma Netewan (KN). Wê çaxê, eger KN jî bawer bike ku ev milet dikare xwe bi xwe îdare bike, pêwîst e dewleta Osmanî ji herêma Kurdan bikişe.

Lê Tirkan bi serokatiya Mistefa Kemal peyman ne pejirandin, û ew derket Anadolê û Kurdistanê. Mistefa Kemal, di bin hest û bihaneyên olî de, Kurd xopandin û kir ku Kurd û Turk bi hev re li hember dewletên ku peymana Sêvrê danî bûn şer bikin.

Mistesfa Kemal ji wî şerî serkeftî derket, ji ber wê jî peymana Sêvrê rewa nedît, û pêkanîna wê li xwe ne girt. Lewre piştî sê salan ji morkirina

peymanê, Tirkan bi wan dewletan re li bajarê Lozanê peymaneke nû mor kirin. Li gor wê, li şûna dewleta Osmanî komara Turkiyê ya îro heye çêbû, û mafê Kurdan bi damezrandina DEWLETEKE SERBIXWE, ra niha hatiye perçiqandin.

## RAHÊNAN li ser deqê

1. *Çar navên bernas ji vê deqê derîne.*
2. *Du navên şênber û diduyên razber destnîşan bike.*
3. *Du navên sade, diduyên pêkhatî û diduyên hevdudanî di deqê de pêş me bike.*
4. *Navekî nebîna yî gelejmar û yekî yekejmar bide destnîşankirin.*
5. *Wateyên van bêjeyan nas bike, û li ezber bike:*

   **Pirs, peyman, hevalbend, hevkar, têkçûn, tixûb, çarçew, guftûgo, nûner, damezrandin, serkeftin, hest, bihane, pejirandin, pêwîst, girîng, morkirin, perçiqandin.**

## SPARTIN

1. *Cureyên navdêran li gor wate û binesaziyê bide nasîn , û li ser her texlîtekê nimûnakê binivîse.*

*2.Çawa mêjera navdêran tê naskirin. Rewşan bijimêre û nimûnan li ser wîne.*

*3. Pirtikên nependiyê çi ne?. Û kînga bikar tên?. Li ser her yekê sê nimûnan bide, û wan di hevokan de bicih bike.*

*4. Komikên navên nêrza û mêza baş bixwîne û binivîse.*

# VEQETANDEK

**Veqetandek**: Alav (parkît) in, bi dawiya navdêr, cinav yan rengdêrekê (*gava ku wek nav were bikaranîn*) dikevin, têkliya wan bi bêjeya dû wan re pêk tînin û zayend û mêjera navdêrê jî didin zanîn.

Di kurmancî de, veqetandek du celeb in, ên navdêrên bîna(binavkirî), û yên navdêrên nebîna (nebinavkirî).

**1.** Veqetandekên **NAVDÊRÊN BÎNA** sisê ne :

**Ê** : Ji yekejmara zayenda nêr re :

**Xortê jîr.**

**A** : Ji yekejmara zayenda mê re :

**Keça jîr.**

**Ên** : Ji gelejmara her du zayendan re.

**Xortên jîr.** **Keçên jîr.**

**2.** Veqetandekên **NAVDÊRÊN NEBÎNA**:

- **î**: Ji bo yekejmara zayenda nêrza.

***Nimûne***:

Curekî malê. **B**arekî giran**.** Xortekî me**.**

- **e**: Ji bo yekejmara mêza û gelejmara her du zayendan. ***Nimûne:***

  Darek**e** sêvê. Stranbêjek**e** dengxweş. Keçek**e** we.
  Keçine/xortine zana.
  Jinin**e** nenas û mêrin**e** biyanî li mûzexaneyê bûn.

Ango mirovên ne nas li mûzexaneyê pir bûn, lê em ji nav wan mirovên nenas, hinekan vediqetînin û çêrê dikin.

**Têbîn**

**1**. Gava ji navdêrekê bêtir bi navedêreke din ve girêdayî bin, û hemî ji yek mêjerê bin, gengazî heye ew bi yek veqetandekê bi wî navî ve werin girêdan, veqetandek jî ji zayenda navdêra paşîn tê birin.

**Kur û keça min. Keç û kurê min.**

*Ji dêvla :* **Kurê min û keça min.**

**2.** Gava ji navdêrekê bêtir li dû hev hati bin û her yek têkildarî yê din be, hîngê her yek ji wan li gor mêjer û zayenda xwe veqetandekeke cihê dibe.

**Pirtûka birayê hevaleke min.**

**3.** Lê eger di nav wan navdêran de rengdêr hebin, hîngê veqetandeka navdêra ku rengdêr salixa wê dide, dikeve pêşiya her rengdêrekê û wan bi navdêrê ve girêdide. Hîngê ew veqetandek mîna cinavekî tê nasîn û wê navdêrê dinimûnin.

**Gul<u>ên</u> gulistanê y<u>ên</u> zer.**

Di vê nimûnê de, a zer gul e, ne gulistan e, lewre veqetandeka gulan (ên) dikeve pêşiya rengdêra wê.

Cinavên ku ji veqetandekan çêdibin, li gor zayend, mêjer, binavkirin û nebinavkirina navdêrê wiha ne:

**- *Navdêrên bîna :* Ê, A, ÊN**

***Y.Jimara nêr:*** **Xortê jîr <u>ê</u> bedew <u>ê</u> ciwan**

***Y.Jimara mê:*** **Dara Êvirsê <u>ya</u> kevnar.**

***G.Jimara her du zayndan*:** **Şagirtên me <u>yên</u> jîr.**

**- *Navdêrên nebîna :* î, e, en.**

***Y.Jimara nêr:*** **Hespekî boz <u>î</u> rewan.**

***Y.Jimara mê:*** **Guleke sor <u>e</u> binxweş.**

***G.Jimara her du zayndan*:** **Sêvine sor <u>en</u> mezin.**

# ÇIYAYÊ HAWARÊ[1]

Hawar, çiyakî herêma Kurdaxê (Efrînê) yî naskirî ye. Ew di navenda Kurdaxê de bi ci dibe. Dirêjahiya wî ya Rojhilat Rojava, dora (10) KM in, û ji (3) ra (5) KMan jî pehn e, û nêzîkî (950)M bilind e.

Li ser û dorçêwirma Hawarê bi qaserî (20) gundan belav dibin, mîna gundên : Hesen Dêra, Zivingê, Dîkê, Şêx, Berbenê û gundê Çiyê yê ku li ser pozê Hawarê ye.

Li başûrê gundê Çiyê nêzîkî (2) KMan, li ser bêleke bilind û tûj, bermahiyên avahiya Keloşka Hawarê hene.

Ji pozê Keloşkê de, ji hêla Başûr û Rojhilat ve, çiyayên Xastiya, Heştiya, Lêlûn, Şikaka û bajarê Efrînê dikevin hembêza mera, û deşta Cûmê ya ku bi sed hezaran darên zêtûnê xemlandî ye, mîna bereke rengîn, bi nazikî li ber lingên Hawarê raxistiye. Ji aliyê Bakur Rojhilat ve jî, ciyayên Zoyêgira û Bilêl ên navdar serên

[1] - Nivîskar: Mihemed. E. Elî

xwe bilind hildidin. Di paş wan de çiyayê Gewir jî li paş sînor bejna xwe bilind dike.

Li Hawarê gelek texlît dar hene, mîna darên: Zêtûn, Benîştok, Qetleb, Êvirs, Sindîgan û Kelemê. Ji bilî daran, rengereng çawîrçiman hene, çiya pê tê xemlandin. Di nav wan darûberên çiyayê Hawarê de, di gelî, newal, şikeft û zinarên wî de, gelek cinawir û tilûr dijîn, mîna gur, heftar, beraz, û kewên ciwan û dengxweş jî lê ciwar dibin.

Rengîniya sirûşta çiyayê Hawarê sur û heybetê bi ser de berdide, ra hiştiye ku şêniyê Kurdaxê navê wî li zaroyên xwe bikin.

Eso şivanekî ji gundê Şorbe ye, bizinine wî yen fîlik hene. Rojekê, li ber rojava, Eso kurkê xwe avêt ber dareke Qetlebê ye rengîn, li ser pal da û xulmaş bû. Lê ji nedî ve gurekî birçî yî dev bi xwîn, hêrişe keriyê bizinan kir, yek ji bizinên fîlik ên ku ji kerî bi dûr keti bû, kuşt û kişande paş kelemê, û yên din jî, her yek bi alîkî de revî. Û herwiha ta Eso lê hayî bû, gur xwe sparti bû Hawarê, û derbê ciyê xwe dîti bû.

**RAHÊNAN li ser deqê**

1. *Li ser her cureyek veqetandekê, nimûnakê destnîşan bike.*
2. *Hevokine navane destnîşan bike, û tê de veqetandekê şanî bide.*
3. *Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike:*

**Kurkê şivên, lawir, tilûr, çawîrçîman, dorçêwirme, ber, navend.**

**SPARTIN**

1. *Veqetandek, tiştekî ji nav tiştan vediqetîne û pêş me dike:*

**- ger ew tişt yekejmar, nêrza û bîna be, bi( … ) tê veqetandin, û eger mêza be bi (…) tê veqetandin, û………………………… be jî bi ( ên ) pêk tê.**

**- Lê di rewşa nebîna de, eger nav nêr be bi ( … ) û mê yan gelejmar be bi ( … ) tê veqetandin.**

2. *Veqetandekê di van hevokan de bi cih bike.*

**- Kolan … , kuçe … û avahî … bajêr di sersalê de dixemilin.**

**- Dara mal … cîran … me Tû ye, dar … me jî Çinar e.**

**- Keçine kurd … xwende hatin.**

# TEWANDIN
## (Verês, çivane)

**Tewandin**: Rewşeke kesandina navdêr û bêjeyên mîna wê ( *rader*, *jimarnav* , *cinav*) ye. Tê de, navdêr li gor zayend û mêjera xwe:

- Yan parkîtên tewangê werdigirin.
- Yan jî hin tîpên xwe bi hinên din diguhêrin.

- **Çawa navdêr tê tewandin ?**

Navdêr bi pêxistina van parkîtan tê tewandin:

**Ê** : Ji bo yekejmara zayenda mê .

**Ez şêrîn<u>ê</u> dibînim.**

**Ez keçek<u>ê</u> dibînim.**

**Î** : Ji bo yekejmara zayenda nêr.

**Ez hesp<u>î</u> dibînim.**

**Ez hespek<u>î</u> dibînim.**

**An** : Ji bo gelejmara her du zayendan.

**Ez keç<u>an</u> û xort<u>an</u> dibînim.**

<u>**Têbîn**</u>

**-** Ji bona tewandina NAVDÊRA BÎNA ya nêrza, eger tîpek ji tîpên wê (e) yan (a) be, çêdibe

û rastir e, ku (e) yan (a) ya dawiyê bi tîpa (ê) were guhertin.

***Wekî :*** *Azad* **: Ez Azêd dibînim .**

*Hesp* **: Ez hêsp dibînim.**

- Lê eger navdêr li dû rengdêrên *nîşankirin*, *nependî*, *pirsiyarî û jimarînê* hati be, tîpên dengdêr (e) û (a) tê de hebin tune bin jî, ew mîna rêzana resen bi (î) tê verêstin.

***Rengdêra nîşankirinê:*** **Ez ji *vî* gundî têm.**

***R.Pirsiyarî:*** **Tu *kîjan* xeftanî dixwazî?**

***R.Nependî:*** **Ew *tu* karî nake**

***R.Jimarîn :*** **Ez *pêncî* gavî meşîm.**

- Di navdêra *nebîna* de, tîpa (n) ji (an) a gelejmariyê dikeve, û parkîta tewangê dibe (a).

*Ji dêvla* : **Ez keçinan û xortinan dibînim.**

*Wiha dibe*: **Ez keçina û xortina dibînim.**

- Carina (a) ji navdêra *bîna* jî dikeve:

**Karê me li ber çavan e … Karê me li ber çava ye.**

- **Kînga tewandin çêdibe ?**

**1.** Gava navdêr kirarê lêkera têper be, di dema borî de.

**Şêrînê, xortekî û hevalan helbest xwendin.**

**2.** Gava navdêr biresera durust ya lêkera têper be, di demên wêbê, niho û raweya fermanî de .

*Niho*: **Memo keçekê, Ferhêd û hevalina dibîne.**

*Wêbê*: **Winê keçekê, Ferhêd û hevalina bibînin.**

*Fermanî*: **Memo! Keçekê, Ferhêd û hevalina bibîne**!

**3.** Gava navdêr biresera nedurust be di hemî deman de.

**Ez ji bajêr bi makînekê hatim.**

**4.**Gava navdêr biresera navekî din be.

**Birayê Binefşê.** **Xwîşka Ferhêd.**

## Têbînek:

Navdêrên ku li dû hev hati bin, û ji yek mêjerê bin, çêdibe tenê navdêra paşiyê, li gor zayend û mêjera xwe bê tewandin.

*Herwekî :* Ez Azad, Şêrîn û welêt dibînim.

# WELAT , WELATÎNÎ[(1)]

Welat xaka bav û kalên me ye.

Welat ew xak e ku, pêşiyên me li wê rabûne, ji bona avahiya wê xebitîne û li wê mirine.

Welat ew ciwar e, ku em tê de sekinîne û rojekê di nav de bêne veşartin.

Xelkê Welatekî, welatiyên hev in. Borî, niha û dawiya wan bi hev re girêdane. Zimanê wan, girêdana wan, her rewş û lebtên wan mîna hev in. Pêşiyên wan li rex hevdû rabûn, rûniştin û mirine.

Welatî bi qencîtiya hev şa dibin, ber xirabiya hev dikevin. Şîn û şahiyên wan yek in.

Xelkê welatekî birayên hev, pismamên hev in. Hergav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşî, avahî û azahiya welatê xwe dixebitin. Xem û armancên wan yek in.

---

[1]. CELADET BEDIRXAN - Kovara HAWARÊ, Hej. 9.

Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînên xwe bêperwa dirijînin. Her dixebitin ku welatê wan nekeve bin destên miletên din.

Lê miletin hene ku welatê wan, bi awakî, ketiye bin destên neyar û dijminan. Ev miletên ha ji bona rizgariya welatê xwe dixebitin. Xebata wan ev e : Rojekê berê mîna miletên din biserxwe bibin.

Hezkirina welêt di dilê me de hêvîneke mezin û bilind e. Em pê xurt, mezin û canfeda ne. Ji wê hezkirinê re welatînî dibêjin.

Welatînî di hundurê me de agirekî pîroz e. Pêta wî agirî ji me re her tiştên welêt dide hez kirin. Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya, deşt, dar û kevirên welatê me ji yên welatên din spehîtir, xweştir û şêrîntir in.

Eger her welatiyek bi vî çavî welatê xwe bibîne, roja azadiya miletê me wê zûtir were.

## RAHÊNAN li ser deqê

*1.Çend nimûnan li ser her rewşeke tewangê destnîşan bike.*

*2. Wateyên van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Welatî, spehî, pêt, bêperwa, armanc, rewş, lebt.**

## SPARTIN

*1.Danasîna verêsê binivîse.*

*2.Parkîtên verêstinê çi ne bide zanîn ? û li ser her rewşekê du nimûnan wîne.*

*3. Kînga navdêr tê tewandin ? Rewşên wê bijimêre, û du nimûnan li ser wîne.*

*4. Kînga tewandin bi guhertina hin tîpên navdêrê çêdibe ? Çar nimûnan li ser wîne.*

*5.Van valahiyan dagire:*

**- Tewandin rewşeke kesandina ………… ye.**

**- Navdêra yekejmar û nêrza, bi … tê tewandin. Lê eger tîpa (e) yan … di navdêra bîna de hebe, tewandin bi guhertina wan bi tîpa … çêdibe.**

**- Navdêra ……………bi (an) tê tewandin, lê eger navdêr nebîna be, tewang bi…… pêk tê.**

*6. Ji nav van hevokan, tîpa (R) li ber ya* rast *dîne, ya çewt jî sererast bike û tewangê bide nasîn.*

**…Tu kîjan têxtî dixwazî?**

**…Ez textekî ji darê çinêr divêm**

**…Azêd pirtûkan dikire.**

**…Ew pirtûkinan ên çi ne ?**

**…Yek a ziman e.**

**…Yek jî li ser dîrokê ye .**

**…Pir baş e, pirtûkên ziman, dîrok û zaniyariyê mirov zanatir dikin.**

# JIMARNAV

**Jimarnav :** Navdêr in, pê jimrara tiştan tê nasîn.

- **Cureyên jimarnavan**

**1.** Jimarnavên **BINGEHÎN**

Ji zîro (0) ta dawiya jimaran.

**2.** Jimarnavên **RÊZÎN**

- Parkîtên (emîn, em) bi jimarê dikevin.

**Yekemîn (yekem) , pêncemîn (pêncem).**

- Bi alîkariya tewangê çêdibe.

**Yekê , diduyan , şeşan , sedî.**

**3.** Jimarnavên **BIREWÎN**

- Bi anîna (yek) li dawiya jimarnavê çêdibe.

**¼ = çaryek.** **1û5 = pêncyek …**

- Bi anîna (ji) li pêş jimarnavan.

**14 = ji çaran yek.** **1/5 = ji pêncan yek.**

**Wekî:** Bawer ne kir mêr bike, malheştekê ( mal + heşt + yekê) doz dike[1].

**4.** Jimarnavên **KOMELÎN**

Bi ducarkirina jimarekê pêk tê.

---

1 - Metelokeke Kurdaxê ye li ser jinan tê gotin.

**Bîstebîst, Çileçil.**

- ## Tewandina jimarnavan

Jimarnav bêjeyeke guhêrbar e, gava dibe bireser, têye verêstin.

Tewanga jimarnavan wiha çêdibe:

**A. Jimarnava (YEK)**

Ev jimarnava, mîna navdêra mêza bi (ê) têye tewandin:

**Ji yek<u>ê</u> bêtir. Yek<u>ê</u> bide min.**

**B . Jimarnava (2 ta 20an)**

Jimarnavên ji didu ta bîstan, mina gelejmarê bi (an) têne tewandin:

**Ez heft<u>an</u> dibînim. Ji panzdeh<u>an</u> bêtir.**

**C. Jimarnavên** ((Nîv, 30- 40- 50- 60- 70- 80-90-100- 200- 300- 400- 500- 600- 700- 800- 900, hezar, lek (deh hezar), kirûr (sed hezar), milyon û milyar)).

- Gava ev jimarnav bi serê xwe bin û bi tiştekî din ve ne girêdayî bin, wek navdêra nêrza bi (î) têne tewandin:

**Çel<u>î</u> bide min. Nîvek<u>î</u> bide min.**

**Bi heftsed<u>î</u> bike. Ji hezar<u>î</u> bêtir.**

- Lê gava jimarnavên han (*nîv*, *hezar*, *lek*, *kirûr*, *milyon*, *milyar* **)** bi jimarnaveke din ve bû bin, ew li gor tewanga wê hejmarê têne tewandin:

**Ji çar hezar<u>an</u> bêtir.** **Ji heftê hezar<u>î</u> kêmtir.**

**Ji yek û nîv<u>ê</u> bêtir.**

- Carina jimarnavên *(sed*, *hezar*, *milyon*, *milyar)* gava rewşeke gelejmar e nebîna diyar dikin, bi (an) tên tewandin:

***Nimûne*: Bi sed<u>an</u>. Bi hezar<u>an</u>. Bi milyon<u>an</u>.**

- Eger (*nîv*) li dû navdêrekê hat, hîngê ew li gor tewanga wê têye tewandin:

**Zebeş û nîv<u>î</u> (nîvek<u>î</u>). Sêv û nîv<u>ê</u> (nîvek<u>ê</u>) bide min.**

## D. Jimarnavên hevdudanî

Di jimarnavên hevdudanî de, tenê hejmara paşîn, li gora tewanga xwe, têye tewandin:

**Ji bîst û çar<u>an</u> ta çel<u>î</u> bijmêre.**

**Di hezar û nehsed û pêncî û şeş<u>an</u> de bûme.**

# ROJ Û ÇAXÊN WÊ[1]

Şev û roj rojek in, roj bîst û çar katjimêr (demjimêr) in. Di jiyana xwe de mirovan ew bîst û çar katjimêr wiha parve kirine: Heyştan dixebitin, karê xwe dikin, heyştan radizin û heyştan jî azad in, di nav wan katjimêran de mirovin hene vedihesin, digerin, dixwînin. Mirovin jî hene karê malê dikin.

Mirovên pêşketî û şaristanî dema xwe vala derbas nakin. Ew dema xwe baş parve dikin. Ew çûn, hatin û karên xwe bi katjimêr û wirdekan dijimêrin.

Katjimêr parve şêst wirdekî dibe, mirov karê xwe bi katjimêr û wirdekan dikin. Eger kesek li hêviya kesekî bû û ew ne hat, ew dibêje: Ez katjimêr û nîvekê li benda te mam, lê tu ne hatî, te got nîv katjimêrê li vir be, ezê bêm, lê tu di soz de ne hatî.

Ronî ji Ferhêd pirs kir :

- Katjimêr çend in ?

- Katjimêr heft û nîv in.

- Emê li katjimêr ji heyştan sêyekek kêm bi rêkevin, ji ber ku wana me li katjimêr heyşt û çaryekekê dest pê dike. Ew vê carê li ser girîngiya

---

[1] . QANATÊ KURDO- Ji pirtûka wî ((Zimanê Kurdî)).

zimên di jiyana gelan de ye. Emê zû herin daku , di rêza yekemîn de rûnin.

**RAHÊNAN li ser deqê**

1. *Nimûneyan li ser cureyên jimarnavan ji deqê derîne.*
2. *Çend nimûnan li ser tewandina jimarnavan xuyan bike.*
3. *Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Wirdek, katjimêr.**

**SPARTIN**

1. *Cureyên jimarnavan bijmêre, û nimûnekê li ser binivîse.*
2. *Van jimarnavan verêse:*

**Yek, didu, deh, bîst, pênc, heştê, hezar, nîv.**

3. *Tewanga jimarnavan di van hevokan de biserî bike.*

Her sal bi hezar… Kurd welatê xwe berdidin, û li welatên biyanî dibin penaber. Di sala hezar û nehsed û nod û şeş… de, dora yanzdeh hezar… bar kirin, lê di sala du hezar û diduy… de, ji car û nîvek… Kêmtir bû.

# CINAV

**Cinav**: Bêjek e, ciyê navdêrê digre, bi karê wê radibe û wê dinimûne.

- **Cureyên cinavan**

Di kurmancî de ev cure cinav hene:

A. Cinavên kesîn.
B. Cinavên nîşankirinê.
D. Cinavên pirsiyarkî.
C. Cinava girêkî (KU).
Ç. Cinavên arzî.
E. Cinavên nebinavkirî.

# Cinavên KESÎN

**Danasîn:** Cinavên kesîn, li şûna navên kesekî, yan tiştekî, têne xebitandin û wan dinimûnin.

Di cinavên kesîn de sê kes, du mêjer û du zayend hene.

Zayenda cinavên kesîn tenê di yekejmara kesê sisiyan a cinavên tewandî de heye.

- ## Nofên cinavên KESÎN

**a.** Cinavên kesîn ên **NETEWANDÎ**:

| | *Y.Jimar* | *G.Jimar* |
|---|---|---|
| ***-Kesê yekê (yê ku daxive):*** | Ez | Em |
| ***-Kesê diduyê (yê ku axaftin pê re ye):*** | Tu | Hûn, win |
| ***-Kesê sisiyê (yê ku axaftin li ser e):*** | Ew | Ew |

**b.** Cinavên kesîn yên **TEWANDÎ**:

| | ***Y.Jimar*** | ***G.Jimar*** |
|---|---|---|
| ***Kesê yekê:*** | Min | Me |
| ***Kesê diduyan:*** | Te | We |
| ***Kesê sisiyan:*** | Wî ***(nêrza)***, wê ***(mêza)***. | Wan |

**C.** Cinavên kesîn ên **KURTKIRÎ:**

**1. Cinava (Ê)**

Ev cinava nêtar e (*ne nêr ne mê*), tenê yekjimariyê dinimûne. Gava cinavên tewandî yên kesê siyem ê yekjimar (wî, wê) li dû lêkerekî werin, tê kurtkirin, û bi dawiya lêkerê dikevin.

**Min gihande (wî, wê) …… Min gihandê.**

**Min da (wî,wê) …… Min dayê.**

**2.** Cinavên **LIHEVXISTÎ**: Gava cinavên tewandî yên kesê siyem (wî,wê) li dû daçekan werin, bi daçekê re dibin yek û cinavine nû çêdibin. Ji wan re cinavên lihevxistî tê gotin.

Ew jî ev in:

Bi (wî, wê) …… PÊ , VÊ re çûn

Li (wê, wî) …… LÊ vegerîn

Ji (wî , wê) …… JÊ tika kir

Di (wî , wê) …… TÊ de ma

**3. Cinavê RAJER (XWE)**

Gava di hevokekê de kirar bireser bi xwe be, hîngê bireser bi cinava (xwe) tê nimûnandin.

***Ez xwe dişom.***

### 4. Cinavê *HEVDÛDÎTIYÊ* (HEV , YEK)

Ew di axaftinê de, du yan sê kesan bi hev re dinimûnin û şûna wan digrin. Li gor zaravên Kurdî, gelek durvên wan yên cihê hene:

HEV: Hevdi, hevdu, hevûdin, hevûdû.

YEK: Yekdi, yekdu, yekûdin, yekûdû.

***Nimûne :***

**- Te ji wî re û wî ji te re pirtûk kirî .**

*Dibe:* **We ji hev re pirtûk kirî.**

**- Ew û Azêd çûn.**

*Dibe:* **Ew û yekdi çûn.**

Gava cinava ( **HEV** ) li dû daçekekê were, hîngê dikane bi daçekê re bibe yek:

Li hev = **LEV** kirin.

Ji hev = **JEV** re peyivîn.

Di hev = **TEV** de çûn.

Bi hev = **PEV** girtin.

## Cinavên NÎŞANKIRINÊ

Cinavên nîşankirinê(şanîdanê) dikevin şûna navdêrekê, û wê bi nîşankirinê şanî didin.

Du cure cinavên nîşankirinê hene, *pîvane* û *qersene*.

**1.** Cinavên nîşankirinê yên **PÎVANE**

**EV**: Tişt û jîndarên *nêzîk* nîşan didin.

**EW:** Tişt û jîndarên *dûr* nîşan didin.

Ev cinav herdem li pêş navên ku dinimûnin tên, eger bi tenê jî hatin, li gor mêjer û zayenda navê ku dinimûnin tewang û veqetandekê dibin.

| | Veqetandek | Tewang |
|---|---|---|
| ***EV :*** | **Evê, eva, evên xwenda.** | **Evî, evê, ewan dar avdan.** |
| ***EW:*** | **Ewê, ewa, ewên xwenda.** | **Ewî, ewê, ewan dar avdan.** |

Carina tîpa (E) ji pêşiya rewşa tewandî dikeve, hîngê ew wiha dibin: WÎ got, WÊ got. Li vir ew mîna cinavên kesîn têne nivîsîn, lewre çêtir e tîpa (E) netê xistin.

**2.** Cinavên **QERSENE**

Ew cinavên nîşankirinê yên pîvane ne, bi veqetandeka xwe re bûne yek û teşe nû standine.

- (Evê, ewê) = **YÊ**: Ji nêrza û yekejmar re.

***Yê* serkeftî.** ***Yê* ketî.**

- (Eva, ewa) = **YA**: Ji mêza û yekejmar re.

***Ya* çav bi kila.** ***Ya* serbest.**

- (Evên, ewên) **= YÊN**: Ji gelejmara her du zayendan re.

***Yên* ku diçin zanîngehê.**

Cinava girêkî (ku), bi tevahî, li dû cinavên qersene tê.

***Herwekî :***

***Ya ku* te dît mala me bû.**

***Yên ku* te dîtin hemsiyên me bûn.**

**3.**Cinava şanîdanê (**HAN**) yan (**HA , HE**).

Ew li dû cinavên şanîdanê ku veqetandek pê ketine tên, û ramana wan xurt dikin. Ew kanin bi wan re bibin yek û cinavine têkelhev jî çêkin .

<u>Ligel **(EV)**</u>

*Evê han* Dibe Eva, vîna, vaya, viya.

*Eva han* Dibe Vêna, vêya, eva

*Evên han* Dibe Evna.

<u>Ligel **(EW)**</u>

*Ewê han* Dibe Ewa, wîna, waya, wiya.

*Ewa han* Dibe Wêna, ewa, wêya

*Ewên han* Dibe Ewna.

# ŞAGIRTÊN POLA YEKÊ[1]

Gulnaz keçeke xwande ye, ew li gundekî bû bû mamoste û şagirtên pola yekê dida xwendin. Lê ji ber ku xwendin li dibistanê ne bi Kurdî bû, wê û şagirtên dibistanê yên biçûk, dijwariyeke zor didîtin, hînbûn li ser wan giran bû.

Ji hêlekê ve Gulnazê nikanî xwendin û nivîsandin bi şagirtên xwe bida zanîn, ji aliyê din ve, zarok jî ji bilî zimanê Kurdî bi tu zimanên din tênedigihîştin.

Gava Gulnazê çare ji vê pirsgirêkê re ne didît, neçar dibû carina, yek gotinan bi Kurdî şirove bike. Wê bala xwe didayê, her ku peyveke Kurdî dibêje, çavên zarokan zelal û rûliken dibin.

Ta rojekê, şagirteke navê wê jî Gulnaz bû, destûra peyvê ji mamosteya xwe xwest, û bi Kurdî pirsî:

- Mamoste, navê min jî Gulnaz e. Mamoste, dema ku tu biçûk bû, ne te jî bi Kurdî xeber dida? Çima tu niha bi Kurdî napeyvî û me pê fêr nakî ?

---

[1] - Nivîskar: Mihemed. E. Elî.

Mamosteyê lê nihêrî berken bû, hat rex şagirta xwe, destê xwe di ser serê wê re bir û got:

- Niha em li dibistanê ne, li dibistana me fêrkirin bi zimanê Kurdî qedexe ye. Lê li derve, em tev bi hev re bi Kurdî daxivin.

Diyar bû ku Gulnazê û hevalên wê nikanîn têbigihîştana, kanî çima ferkirin û dengkirin li dibistanê bi zimanê wan qedexe ye ?

Dibêjin jî, li van welatan, ((dîwar bi guh in)). Lewre çend roj neçûn, bi bihaneya ku Gulnaz hesta netewî ya Kurdî di nav zarokan de belav dike, ew ji mamostetiyê hate bidûrxistin. Lê berî ku ew ji dibistanê bi derkeve, çû pola yekê, destê xwe danî ser serê Gulnaza xwe û got :

- Gulnaz, ezê jivirûhade bibim mamosta zimanê Kurdî û we li mal hîn bikim.

Ji wê rojê de, piştî ku Gulnaz karên xwe yên malê bidawî dike, di mala xwe de, minalan hîn xwendin û nivîsandina Kurdî dike.

**RAHÊNAN li ser deqê**

*1. Cinavên kesîn ên netewandî û tewandî destnîşan bike.*

*2. Li cinavên qersene bigere û pêş me bike.*

*3. Li durvên cinavên nîşankirinê bigere û pêş hevalê xwe bike*

*4.Wateyên van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Pol, hest, şagirt, jivirûhade, bihane, netewî, têgihîştin, qedexe, fêrkirin, pirsgirêk, minal.**

**SPARTIN**

*1. Ji nav cinavên kesîn ên jêrîn, cinavên netewandî* (S), *ên tewandî (T) û yên kurtkirî (K) li ber dîne:*

**Ez…, wan…, tu…, we…, ew…, me…, em…, (wî,wê)…, te…, min…, ( win,hûn )…, ê…, xwe…, (yek , hev)…, pê…, lê…, jê…, tê….**

*2. Li ser her cureyek cinavên kesîn hevokekê binivîse.*

*3. Cinava şanîdanê (ev) di van rewşan de bitewîne :*

**Yekejmara nêrza……… Gelejmara mêza……**

*4.Du cinavên nîşankirinê yên pîvane hene,……û ……. Ev her du cinav mîna navdêra ku dinimûnin ……… û …………… dibin.*

*5. Cinavên nîşankirinê yên qersene sisê ne, ew ji tevlîhevbûna cinavekî …………û …………pêk tên.*

*6. Cinavên jêrîn di kîjan rewşê de ne, bide nasîn:*

**Ewa………… , ewên…………, ewê …………**

*7 .Binyata van cinavên qersene binivîse:*

**Yên:……………,ya: …………,yê:……………**

# Cinavên PIRSIYARKÎ

Cinavên **PIRSIYARKÎ** raweya pirsyariyê pêk tînin, ew jî ev in:

- **KÎ, KÊ**: (Kî) ji kesan re ye. Di rewşa tewandî de dibe (kê).

  **Kî hat ?. Kê got ?.**

- **ÇI**: Ji lawir û tiştan re ye ?.

  **Çi dixwazî ?.**

- **KÎJAN**: Her tiştekî dinimûne.

  **Kîjan hat ?.**

- **ÇEND**: Tenê gelejmariyê dinimûne.

  **Çend çûn ?.**

- **KÛ**: Ji pirsa cih re bikar tê.

  **Li kû rûnişt ?.**

Ji bilî cinavên pirsiyarkî, pirs bi derbdayînê jî çêdibe, ango gava zixt û giranî diçe ser bêjeya pirsê, yan ser kîta dawiya wê:

| | |
|---|---|
| **Te sar e ?** | **Hevalê min hat ?** |
| **Ew bezî ?** | **Ew dibezin ?** |

# Cinava GIRÊKÎ (KU)

Cinava (**KU**) li paş navdêr û cinavan tê. Ew ji bo her du zayend û mêjera ye.

**( Mêrê, ewê, ê) *ku* hat.**

**(Jina, ewa, a) *ku* hat.**

**Têbîn:**

Di kurmancî de (KU) yeke din heye, ew gihanek e, li dû lêkeran tê:

**Min got *ku* ezê herim.**

# Cinavên ARZIYÊ

Ev cinav xwediyê tişt dide nasîn; Cinaveke nîşankirinê ye qersene *(tişt dinimûne)* li pêş tê , û cinaveke kesîn e tewandî *(ku xwediyê tişt dinimûne)* li paş tê, û wek cinavê arziyê tê nasîn.

**1. Yekejmara nêrza**

- **YÊ** (xwe, min, te, vî, vê, wî, wê, me, we, wan, van).

**2. Y. Jimara mêza**

- **YA** (xwe, min, te, vî, vê, wî, wê, me, we, wan, van).

**3. Gelejmara her du zayendan**

- **YÊN** (xwe, min, te, vî, vê, wî, wê, me, we, wan, van).

## Cinavên NEBINAVKIRÎ

Ev cinav dikevin şûna navdêrên ku di axaftinê de bi awakî ne dîdar hatine şanîkirin.

Du cureyên cinavên nebinavkirî hene; sade û hevdudanî:

**1.** Cinavên nebinavkirî yên **SADE**, ev in:

(( Filan, bêvan, yek, kes, kesek, tu, tişt, tiştek, hin, hinek, hemî, giş, gelek, hecî, kê, hîç, her…)).

**2.** Cinavên nebinavkirî yên **HEVDUDANÎ**, ev in: (( Filankes, filantişt, tutişt, hertişt, heryek, herkes)).

Ji bilî wan her du cureyan, bêjene din hene carina wek cinavên nebinavkirî bikartên.

***Herwekî :***

**Çend (çendek), hemî ( hemû), giş (giştik, gî), gelek, hecî, kî (kê).**

# SIRÛŞT DAYÎKA ME YE[1]

Du mirov weha bi hev re daxivîn:

- Tu ji her tiştî re dibêjî: Ev tiştekî ji sirûştê (xweza, xwerist) ye, yanê yê min û te ye, gerek e çavê me lê be. Em li kû bin û civat çi be, parastina sirûştê ji ser zimanê te danetê, ev çi meraq e li ba te peyda bûye, ku tu xwezayê di ser her tiştî re digrî. Hîç tu kes nikane ji dest te, di eyarê xwe de bilive, tu dibêjî: Ha filankesî darek biriye, bêvankes diçe nêçîrê û tilûran dikuje, hinek welatî kolanan qirêj dikin, makîna filanî dûyê reş berdide û jîngehê kavil dike, nizanim kê filantişt di derheqê jîngehê de dike.

Yanê bi ya te be em hemî di dermafê sirûştê de gunehkar in, û giş dijminê sirûştê ne!. Ma sînorên sirûşta ku tu dixwazî em biparêzin çi ne? Em kîjan hêmanên wê biparêzin û kîjanan berdin ?!.

- Biracan, berî gişî, kî dibêje ku sirûşt ya min tenê ye? Sirûşta ku li ser dibasim ya me tevan e, gerek e em hemî lê miqate bin û jê hez bikin. Her tiştê ku li gerdûnê heye û bê dest û vîna mirovan hatiye dîtin,

[1] - Nivîskar : Mihemed. E. Elî.

jê re sirûşt tê gotin; zemîn, çiya, av, ba, ezman, şev, roj, germ, serma, mirov, lawir, darûber…û hwd. Ev hemî tişt endamên gerdûnê ne, têkelî hev bûne û xweza afirandine. Ma kî kane bêje filan endam yê min e, û bêvan endam yê filankesî ye.

Ezê hema çend nimûnên biçûk li ser jîngeha ev bajarê me yê biçûk, Efrîn, ji te re wînim:

Ava çêşmê û bermayiyên pîşesaziyan berdane ser çem Efrînê. Ew ava çêm genî dikin, û jîndarên wê dikuje. Ji qirêja bajêr lodên mezin çêdibin, li şûna ku ew bi şêweyên nûjen werin rakirin, wê li çolê dirijînin û dişewtînin  û jîngehê xerabtir dikin. Tu dibînî çawa çiyê dikolin û çalên mezin lê vedikin, ma ew ne kavilkirina sirûştê ye?!.

Yekdin ji wan biçûktir, gava tu diçî havîngehekê yan ber avekê û qirêjê li wir dibînî, tu ji yên ku qirêj belavkirine û li şûna xwe hîştine re gazinan nakî!?.

Ta govdê mirov dîsa pariyek ji sirûştê ye, gerek e mirov   lê miqate be, da bi teşeyê herî baş û xweşik were dîtin, ji ber ku sirûşt pê spehîtir dibe.

Belê kekê min, em tev ji sirûştê ne, ew dayîka me hemiyan e, em jî pariyek jê ne, bi qaserî ku em jê

dibin, gerek e em bidinê û biparêzin, da xweştir , ciwantir û şêrîntir bibe û bimîne.

**RAHÊNAN li ser deqê**

*1.Çend cinavên pirsiyarkî, nebinavkrî, arzî û cinaveke girêkî destnîşan bike.*

*2.Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Sirûşt, xweza, spehî, teşe, kolan, çêşme, pêşesazî, havîngeh, çal, hawîrdor, kavil, têkilhev, endam.**

**SPARTIN**

1. *Pênc hevokên pirsiyariyê bi alîkariya cinavên pirsiyarkî birêse, û bersivan jî bide.*
2. *Du hevokên pirsan bi derbdayînê saz bike, bila di yekê derb li ser bêjeyê, û di ya din de derb li ser kîta dawiya bêjeyê be.*
3. *Cihên vala dagire:*

**Cinavên arziyê ji cinavekî Qersene ku ………………… dinimûne, û cinavekî ………………. ku xudiyên tiştan dinimîne, pêk tê.**

4. *Cinavên nebinavkirî binivîse.*
5. *Di vê kurtedeqê de, kîjan (ku) cinav e, û kîjan pevgih e, di nav kevanan de binivîse.*

**Gava min got ku (………) ezê werim, ez xwediyê şora xwe me. Lê yê ku (………) got û ne hat, ew ne dilsoz e ku (………) ciyê baweriyê be.**

# RENGDÊR

**Rengdêr**: Bêjeyek e, bi navdêrê re tê, cure , reng, wate û salixa wê destnîşan dike. Rengdêr bêjeyeke ne guhêrbar e, ango tewangê û veqetandekê nabe.

- **Cureyên rengdêran**

***A.*** Li gor **BINESAZIYÊ**

Rangdêr sê koman in, *sade*, *pêkhatî û dumil*.

**1.** Rengdêrên **SADE**

Ji bêjeyeke bi tenê pêk tên.

***Herwekî:***

**Sor, qels, dirêj, kurt, bilind, teng, çeleng…**

**2.** Rengdêrên **PÊKHATÎ**

Bi alîkariya pêrkît û parkîtan tên çêkirin.

**-** *Pêrkît* **:** **hevrê, hemkar.**

- *Parkît*: **Canbaz, hişyar, aştiyane, bajarî, pîşesaz, zana.**

**3.**Rengdêrên **DUMIL**

Ji ducarkirina bêjeyekê, yan jî ji pevgirêdana du bêjeyan pêk tên.

***Wek:*** **Giranbuha, dilşad, dilşewitî, durû, destbira, bêbext.**

*{Ji bo sazkirina rengdêrên sazber,li mijara bêjeyê vegere}*

***B.*** Li gor **DELAMETÊ**

Du cureyên rengdêran hene, yên **salixdanê** û yên **destnîşankirinê.**

**1.** Rengdêrên **SALIXDANÊ**

Ew li paş navdêr û cinavan tên û wan salix didin.

***Wek:*** **Hespê *reş*. Werzişvanê *beza*. Matora *xurt*.**

**Ev keç *bedew* e. Çiyayên me *bilind* in.**

**2.** Rengdêrên **DESTNÎŞANKIRINÊ**

Eger jimarnav yan cinavên nîşankirinê, pirsiyarkî û nebinavkirî di hevokê de li pêş navdêrê werin, ew mîna rengdêran têne naskirin.

***Nimûne:***

Jimarnav: ***Deh* roj derbas bûn.**

Nîşankirin: ***Ev* keça jîr bi Kurdî dixwîne.**

Pirs: ***Çend* şehîd ketin?.**

Nebinavkirî**:** ***Hemî* mirov hatin.**

- **Beramberkirina rengdêran**

Bi giranî beramberkirina rengdêran bi van sê şêweyên jêrîn çêdibe:

***A.*** Beramberkirina **JI HEV BÊTIR**

Ew nîşan dike ku taybetmendiyeke tiştekî ji ya din bêtir e. Ew bi alîkariya parkîta (tir) pêk tê.

**Dirêj …Dirêjtir.** **Ciwan …Ciwantir.**

**Kurt … Kurtir.** **Çê …… çêtir**

***B.*** Beramberkirina **HERÎ BÊTIR**

Bi alîkariya parkît (tirîn) pêk tê.

**Şiyar jîr<u>tirîn</u> şagirt e.**

**Alan jîr e, Demhat jîrtir e, lê Bahoz jîrtirîn e.**

Carina bi bêjeya (bêrde) jî çêdibe.

***Wek* :** **Hawar bêrde jîr e.**

***C.*** Beramberkirina **WEKHEV** : Bi alîkariya ( wek, wekî, bi qasî ), çêdibe.

**Tu bi *qasî* min dirêjî.** **Ew *(wek,wekî)* hev in.**

# REWŞENBÎRÊ KURD CASIMÊ CELÎL (1908-1998)[1]

Gorbuhiştiyê hêja Casimê Celîl, di nav kurdên Sovyeta berê de, yek ji rewşenbîrên sereke bû. Ew ji ronakbîrên pêşîn bû di nav Kurdên Sovyetê de; wek: Qanatê Kurdo , Ereb Şemo, Haciyê Cindî, Emînê Evdêl, Wezîrê Nadirî, Qaçaxê Mûrêd, Eliyê Evdilrehmên, Seîdê Îbo, Pişkoyê Hesen û …hwd.

Apê me Casimê Celîl, hem helbestvan bû û hem jî bi çalakiyên xwe yên bê rawestan di ber kultura gelê Kurd de dihat naskirin. Ji bilî wê, wî nifşekî zana û zîrek perwerde kir û li dû xwe hîşt.

Kurê wî yê mezin Prof. Dr. Ordîxanê Celîl pisporekî mezin e di warê folklora Kurdî de. Yê jê biçûktir Prof. Dr. Celîlê Celîl, dîroknivîsekî bi nav û deng e, di nav çel melyon Kurd de naskirî ye. Keça wî ya jîr û hêja Cemîla Celîl mûzîkvan û folklorîstekî jêhatî ye. Van rêzdarên gewre

---

[1] .Nivîskar : KONÊ REŞ -kovara (PIRS) hejmar (19)-2000.

jiyana xwe dane dîrok, folklor û mûzîka Kurdî û bê rawestan dixebitin.

Di 24-10-1998an de, apê me Casimê Celîl gewrika dinyayê winda kir, piştî ku tam nod sal ji temenê xwe bi tal, tûj û bi hesreta dîtina warê bav û kalan derbas kir. Li dawiyê, guvdê wî yê pak bi tenê li ser girekî dora panzdeh kilomitiran dûrî Yerîvanê ye, hate veşartin.

Ji başûrê gora wî de, çiyayê Araratê bi kofiya xwe ya sipî ber bi ezmanê şîn ve bilind dibe, ev çiyayê ku bûye goristana şehîdên şoreşa Araratê, ya di navbera salên 1927 an û 1930î de rabû bû.

**RAHÊNAN li ser deqê**

1. *Çend nimûnan li ser rengdêrên sade, pêkhatî û dumil destnîşan bike.*
2. *Rengdêreke salixdanê û yeke destnîşankirinê destnîşan bike.*
3. *Nimûnekê li ser beramberkirina rengdêran di vê deqê de destnîşan bike.*
4. *Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike:*

**Gorbuhiştî, ronakbîr, perwerde, pispor, dîroknivîs, rêzdar, gewre, guvde, temen.**

**SPARTIN**

*1. Cihên vala dagire:* ***Rengdêrên …………… li pêş navdêran tên.***

*2. Çar hevokan li ser rengdêrên salixdan û destnîşankirinê binivîse.*

*3. Rengdêrên salixdanê bêjene neguhêrbar in, lewre ew tewangê û ……………nabin.*

*4. Li ser her parkît û pêrkîtên ku me di wanê de anîne du rengdêran binivîse.*

*5.Van rengdêran bi raweyên beramberkirinê yên di wanê de hatine binivîse.*

**Rast : ………………, ………………………**

**Ciwan : ……………, ………………………**

*6. Bêjeyên ji stûnê yekê li ber ên ji stûnê diduyê dîne, daku rengdêreke hevdudanî jê saz bibe:*

| | |
|---|---|
| **Xu** | **………vala** |
| **Kum** | **………bilind** |
| **Du** | **………rû** |
| **Poz** | **………sar** |
| **Dest** | **………sor** |

# HOKER

**Hoker**: Bêjeyek e, wateya rengdêr û lêkeran temam û zelaltir dike.

- ## Cureyên hokeran

Hoker heft cure ne, di her cureyekê de jî, gelek hoker hene, lê rê li vir nîne ku em hemiyan bijimêrin, lewre emê bi anîna nimûnekê li ser her curekê bes bikin:

- Hokerên **rewşan:**

**Ez *xweş* dizanim tu *têr* ne bû.**

- Hokerên **mêjer û çiqasiyê :**

**Min *gelek* pirtûk kirîn, te jî *pir* kirîn?.**

- Hokerên **çaxê :**

**Ez *îro* hatim, û ezê *îşev* herim.**

- Hokerên **lûsê:**

**Ew li *derve* ma, ez ketim *hundur*.**

- Hokerên **çespandin û xweziyê :**

***Bêguman, birastî,* ez ji te hez dikim.**

- Hokerên ***nakirinê* :**

**Min *ne* dît, *ne* bihîst û *nema* dipeyivim.**

- Hokerên ***guman û pirsiyariyê* :**

**Tu li *kû* yî ? *Belkî* werim ! Te *çilo* bibînim?.**

# GIHANEK

Gihanek bêjeke xweser e, bêje û hevokan bi hev ve girêdide.

***Nimûne :*** **Leşker diçûn <u>û</u> dihatin.**

Gihanek du cure ne, *sade û hevdudanî.*

## 1. Gihanekên SADE

Bi tenê tên xebitandin, navdêr, lêker û hevokan bi hev ve girê didin. Gihanekên sade ev in:

((Û, an, yan, ango (yanê), lê, ku, ca , ta, eger, heger, ger, qey, lewma, Loma, lewre, lew)).

## 2. Gihanekên HEVEDUDANÎ

Ew jî ev in: (( Ji lewre, lê belê, berî ku, bêyî ku, çawa ku, çima ku (çimku), çiqas ku, da ku, dema ku, herçend (heçî), heya ku, bona ku (ji bo ku, ji ber ku), kînga ku, li şûna ku, ji dêvla ku)).

Gihanekine hevdudanî en din jî hene du perçen e, ew bi kêrî pevgirêdana du hevokan tên, parçeke wan di hevokekê de tê, ya din jî di hevokeke din de tê û her du hevokan bi hev ve girêdidin. Ew jî ev in: Jî… jî, çawa…wisa, wisa…çawa, ne…ne, yan…yan, hem…hem

(hin…hin), carina… carina, çiqas…ewqas, ewqas…çiqas, çi… çi , ha… ha.

## DAÇEK

**Daçek**: Bêjek e, li pêş navdêr, jimarnav û cinavan tê xebitandin.

- **Daçekên RASTEQÎN** ev in:

((Bi, bê, di, ji, li, bo, ji bo, ji ber, qandî (qasî, qaserî), qey)).

Pirtikin jî hene, di hevokê de li dû daçekên rasteqîn tên, û wateya hevokê zelaltir dikin, ji wan re PAŞDAÇEK tê gotin.

- **PAŞDAÇEK** jî ev in:

**DE** : Rewşa cîwar destnîşan dike.

**Di karê xwe *de* jîr be.**

**RE** : Rewşa pev re destnîşan dike.

**Ji mirovê qenc *re* rêz bigire**.

**VE** : Rewşa tevahiyê destnîşan dike.

**Bi mal û zarokên xwe *ve* çû.**

# BANG

Bêjek e, nîşan dike ku mirovek gazî mirovekî din dike. Di vê rewşê de her navek parkîtên bangê, li gor zayend û mêjera xwe werdigirin.

Bi gelemperî, ew **parkît** ev in :

**O** : Ji bo yekejmara nêrza, û carina (lo) jî li pêş navdêr tê.

**Xorto ! Lo xorto !**

**Ê** : Ji bo yekejmara mêza, û carina (lê) jî li pêş navdêr tê.

**Dotmamê ! Lê dotmamê !**

**INO** : Ji bo gelejmara her du zayendan.

**Keçino , xortino.**

Rewşa bangê ya gelejmar dikare bi alîkariya alava baneşanê (**GELÎ**) jî bête sazkirin. Hîngê (gelî) dikeve pêşiya navdêrê, navdêr jî di rewşa tewandî de tê.

***Wekî:*** **Gelî mirovan** *ji dêvla :* **Mirovino**

**Gelî Kurdan** *ji dêvla :* **Kurdino**

# FOLKLORA KURDÎ[1]

Bê guman, dewlemendî û mezinahiya zimanan bi folklor, rewş û pergala tore, rist û nivîsarên wan e.

Çi zimanê ku folklor û tore têde fireh û mezin bûne, ew ziman, ji zimanên mezin têne jimartin. Her wekû pêşveçûna dezgeh û jîna civakî jî, yek ji van tiştan e, ku zimên pêşve dibin û fireh dikin.

Di vê meydanê de, zimanê Kurdî gelek dewlemend, mezin û payedar e. Ji her nifş helbest, lawik, heyran, istiran, serpêhatî, çîrok û lîstik dagirtiye.

Kurd ji biçûkayî de, zarokên xwe hînî van tiştan dikin. Hên di pêçekê de ji wan re dîrok, istiran û çîrokan dibêjin. Ji lewre, çawa çavê xwe vedikin û zimanê xwe digerînin, dest bi rist, hûnan û istiranan dikin, bi her tiştî dilîzin, û di şevbêrkên xwe de hînî van tiştan dibin. Ji lewre,

[1]. CEGERXWÎN, 27-11-1965. Ji pêşgotina pirtûka wî: ((Folklora Kurdî )).

em dibînin, ku zarokên Kurd hişyar, hozan, dengbêj û çîrokvan in.

Lê pir cihê axînê ye, ku ta niha, tiştekî hêja di meydana civandina Folklor de ne hatiye çêkirin, ne hatiye nivîsandin û belavkirin. Belkî jî nehatiya bîra kesî, ku berê xwe bide vî karî, û karekî bi rûmet ji welat û gelê xwe re bike. Tenê di vî sedê bîstem de, çend nivîştên hêja li nav Kurdên Ermenistanê û Îraqê hatine çapkirin.

Di îro de, çi tiştên ku em bixwazin çêkin, nikarin tekûz û pêkhatî bînin meydanê. Ji ber ku, welatê me di îro de bi çend xêzan di nav çend dewletan de hatiye perçekirin û hemû jî nahêlin heta em bi zimanê xwe tiştekî bibêjin, û ji hawîr zor û setem weke hîm û latan bi ser pişta me de hatine berdan û nikarin bi hêsanî xwe ji bin giraniya wan derxin.

Xwendevanên delal, pir hêvîdar im, ku winê piştî me re, xweştir û çêtir binivîsin û bêtir pêşve biçin. Ji ber ku, pir hêvî heye ku çax û demên we ji yên me xweştir û çêtir bin.

**RAHÊNAN li ser deqê**

1. *Çend nimûnan li ser cureyên hokeran destnîşan bike.*
2. *Çend gihanekên sade û çendên hevdudanî destnîşan bike.*
3. *Çend daçekên rasteqîn ligel paşdaçekan destnîşan bike.*
4. *Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Hêvîdar, hawîr, setem, xêz, pergal, şevbêrk, pêçek.**

**SPARTIN**

1. *Li ser her rengekî hokerê nimûnekê wîne, û hevokekê pê saz bike.*
2. *Sê gihanekên sade, û pêncên hevdudanî vebjêre, û di hevokan de bi cih bike.*
3. *Sê daçekan vebjêre û her yekê di hevokekê ke.*
4. *Her paşdaçekekê ligel daçeka wê têxe hevokekê.*

# LÊKER

Hevoka ku lêker tê de hebe, jê re hevoka lêkerî tê gotin.

***Wek:***

**Şêro pirtûkan <u>dixwîne</u>.**

**Gava ez *çûm,* tu *dihatî,* lewre me hevdu ne *dît.***

Beşên sereke yên hevoka lêkerî ev in:

## <u>Kirar</u> , <u>bireser</u>, <u>lêker</u>

- **Kirar**

Ji kes, giyanewer û tiştê ku lêker rewş, gotin, bûyîn yan kirina wî pêş me dike re **KIRAR** tê gotin.

Kirar dikane *navdêrek, cinavek, raderek, çêbiwarek* be. Kirar li pêş lêkera xwe tê.

***Em* hatin. *Hesp* dibeze. *Xwînî* têkçûn**

***Mirovê zana* hat. Ç*iyayê bilind* ji dûr ve xuyan dibin.**

- **Bireser**

Ji kes, giyanewer yan tiştê ku karê kirarê derbas ser dibe re **BIRESER** tê gotin.

Bireser kane: *Navdêrek, cinavek, rengdêrek, çêbiwarek, raderek yan kombêjeyek be*.

**Xanim *destê xwe* dişo.**

**Balefir bi *ezmên* ket.**

Du cure bireserê hene : *Durust* û *nedurust*.

## *A.* Biresera DURUST

Biresera durust yekser û bê alîkariya daçekê dikeve bin bandora kirarê.

**Mêrxaz *welatê xwe* diparêzin. Viyanê *Dêrsim* dît.**

## B. Biresera NEDURUST

Biresera nedurust bi awakî ne yekser, bi alîkariya daçekê dikeve bin bandora kirarê.

**Dilêr *li Efrînê* rûdine.    Ez *ji Xemlînê* hez dikim.**

**Çavê min *li we* ye.**

Gava biresera nedururst cih, çax, dem û sedemê diyar bike, jê re **BIRESERA HOKERÎ**(1) tê gotin.

**Ez *li Dirbêsiyê* dixebitim.**

**Dîlan *bi qîret* dixebite.**

---

1. Kamîran Bedirxan jê re ( biresera kifşdanî ) gotiye.

Bi tevahî, bireser dikeve navbera kirarê û lêkerê. Lê digel lêkerên têneper biresera ne durust li dû lêkerê jî tê, û hîngê bê daçek dibe.

***Nimûne :***

**Leylan *ji Reco* tê.** **Leylan dere *Reco.***

**Rohêv *ji Kobanyê* diçû.** **Rohêv diçû *Kobaniyê.***

- **LÊKER**

  Lêker bêjeyeke guhêrbar e, kirin, biwîn û rabûnrûniştinê destnîşan dike, û bê wê em nikanin ramanên xwe bidin zanîn.

**Rêzdar *dixwîne.*** **Pîroz keçeke ciwan e.**

Lêker li gor durv û delametê wiha par ve dibin:

***A***. Li gor **DELAMETÊ,** lêker *têper yan têneper* e.

**a. Lêkera TÊPER**

Ev lêker biresera durust distîne.

**Jînê *pirtûk (B.durust*) *bi peran* (*B.nedurust*) kirî.**

Lê gava ku bireser li paş lêkera têneper were pêdivî bi daçekê nîne:

**Arîn *ji zanîngehê* çû.** **Arîn çû *zanîngehê.***

**b. Lêkera TÊNEPER**

Ev lêker biresera ne durust distîne.

**Tîrêj *bi makînê* diçe …… Tîrêj diçe.**

***B.*** Li gor **DURV** , lêker du cure ne **:**

- Lêkera *biservehatî*: Li gor rêzikên naskirî têne kesandin.
- Lêkerên *nebiservehatî (rêzder)*: Ew ne li gor rêzikên naskirî têne kesandin.

***Nimûne:*** *Rader*: **gotin**. *Borî* : *Got*. *Niho* : ***Dibêje***.

*Rader:* **Hatin**. *Borî* : *Hat*. *Niho :* ***Ditê***.

# CEGERXWÎN[1]

Navê seydayê Cegerxwîn Şêxmûs kurê Hesen e. Seyda di sala 1903 an de ji dê û bavekî feqîr hatiye dinê. Berî ku mezin bibe bavê wî çûye rehmetê, û sêwî li nik xuha xwe maye.

Seydayê Cegerxwîn, biçûkî û berxortaniya xwe bi şivanî û cotarî borandiye. Piştî vê demê, ji nû ve çav daye xwendinê û ketiye rêza feqehan. Di demeke ne dirêj de ketiye pêş hevalên xwe, û şehadeta (Îlmê şerî’etê) standiye.

Di vê navberê de, tevgera serxwebûnê di nav Kurdistanê de dest pê kiri bû. Lê mixabin, bêbextî û dilreşiya şêx û axan ne hîşt ku ev xebata welatî biçe serî, Şêx Seîd bindest û dîl û gelê Kurd jî şerpeze û bê rûmet kete bin dest û lingên neyêr.

Ji bo çavşikandina miletê Kurd, kuştin, bi êgir sotin, serjêkirin, ji welêt derxistin, heps û nefî kirin, di vî warî de herçiya ku ji destê Tirkan

---

[1]. Nivîsara OSMAN SEBRÎ, JI pêşgotina dîwana duyem ya Seydayê Cegerxwîn -1954

hat, derheqê miletê Kurd de texsîr ne kirin. Van kirên neyêr, ruhekî nuh di seydayê me de hişyar kir, û hezkirina Kurd û Kurdistanê xiste dilê wî.

Berî standina (îcaza şerîetê), Cegerxwîn bi feqetî çû bû Kurdistana Îraqê û Îranê. Vê gera han jî di canê Seyda de şopeke çak û ronak hîşti bû. Derdê milet hêdî hêdî bîr dibir. Milet ji nezanî û bêtifaqiyê dîl û bindest ma bû; şêx û mela, beg û axa ji van kêmasiyan berpirsiyar bûn.

Şêx û melan bangîna xwe ji miriyan dikirin; mîr û paşe, beg û axan jî bangîna xwe ji neyarê milet û welêt, ji kolîdar dikirin. Ji lewre, Cegerxwîn berê xwest şêx û melan ji wacibê wan hişyar bike. Lê dema dît ku wan çav dane xwarina malê milet û bindestiya wî û dest dane destê neyaran û xulamiya wan dikin; xîreta Seyda qebûl ne kir ku di nav wî refê bêbext û bêrûmet de bimîne, rabû cibe û şaşik avêtin, û wek camêran destên xwe vemalan û daket qada xebata welêt.

Ev e tiştekî kurt û serpilikî ji jîneniîgariya Seydayê Cîgerxwîn.

## RAHÊNAN li ser deqê

*1. Çend kiraran destnîşan bike.*

*2. Çend bireserên durust û çendên nedurust nîşan bike.*

*3. Ji lêkerên têper û têneper didiwan bide nasîn.*

*4. Wateyên van bêjeyan li ezber bike.*

**Serpilik, jînenîgarî, qad, berpirsiyar, şopek çak û ronak, kirên neyêr, li nik.**

## SPARTIN

*1. Kirar û bireserê bide nasîn, û li ser her yekê du hevokan wîne.*

*2. Li ser her cureke lêkerê yên ku me di wanê de şirove kirine du hevokan birêse.*

*3. Kînga bireser li du lêkerê tê ? Du nimûnan binivîse.*

# HÊMANÊN LÊKERÊ

Di kurmancî de çar hêmanên lêkerê hene:

***Kes, mêjer, dem, rawe.***

## 1. Kes

Sê kesên lêkerê hene. Her yek ji wan bi nîşandekeke cida tê nasîn. Nîşandek jî bi dawiya lêkerê dikevin. Kes wiha bi nav dibin:

a. **PEYVOK,** Kesê yekê, yê ku daxive, nîşana wî ya yekejmariyê (im)e.

**Ez dixwînim.** **Em dixwînin.**

b. **GUHDAR,** Kesê diduyan, yê ku pêre tê axaftin û guhdar dike, nîşana wî (î) e.

**Tu dixwînî.** **Hûn dixwînin.**

c. **NEDIYAR,** Kesê sisiyan, yê ku axaftin li ser e, nîşana wî (e) ye

**Ew dixwîne.** **Ew dixwînin.**

Wek ji nimûneyê xuya dibe, nîşana gelejmar a hersê kesan (in) e.

## 2. Mêjer

Wek me li jor dît, du mêjer di lêkerê de hene: *Yekejmar û gelejmar*.

***Y. Jimar*** **: Ez dixwînim. Tu dixwînî. Ew dixwîne.**

***G. Jimar* : Em , Hûn , Ew dixwîn<u>in</u>.**

Bi gelemperî, lêker ji aliyê kes û mêjerê ve bi kirarê xwe ve girêdayî ye, eger kirar yekejmar be, lêker nîşana yekejmariyê dibe, û eger kirar gelejmar be, lêker jî dikeve durvê gelejmariyê û bi wî rengî mêjera kirarê jî xuya dibe.

***Kirar yekejmar e* : Patoz gênim diçine.**

***Kirar gelejmar e* : Patoz gênim diçinin.**

Lê belê di demên borî yên lêkerên têper de, lêker durvê xwe li gor kes û mêjera bireserê distîne, eger bireser yekejmar be lêker di rewşa yekejmarê de tê, û eger bireser gelejmar be, lêker wê xuya dike û nîşana gelejimriyê distîne.

***Mînak :*** ***Bireser yekejmar*: Zarokan *sêv* xwar.**

***Bireser gelejmar*: Zarokan *sêv* xwar<u>in</u>.**

## 3. Dem

Di zimanê Kurdî de, sê demên sereke hene:

**a**. Dema **BORÎ :** Karek berê bûye.

**Ez çûm Tu hatiy<u>e</u>.**

**b**. Dema **NIHO** : Kar niha di dema axaftinê de dibe.

**Ez <u>di</u>xwînim. Ez <u>di</u>çim<u>e</u>**

**c.** Dema **WÊBÊ :** Karek dê di paşerojê de bibe.

**Ezê <u>bi</u>xwînim.** **Ezê <u>bi</u>çim.**

**- BERLÊKER**

Gava kîtên (e, di, bi), yên ku di nimûneyên jorîn de xêzek di bin de ne, bi pêş yan paş lêkerê dikevin, çaxa lêkerê xuya dikin. Ji wan pirtikan re *berlêker* tê gotin.

## 4. Rawe

Rawe durv û aweya kirina lêkerê pêş me dike. Raweyên lêkerê yên sereke ev in:

*Raderî, pêşkerî, hekînî, bilanî, fermanî û çêbiwarî.*

Emê li vir, tenê li ser raweya raderî rawestin. Ji ber ku, yên din, dê di wanên pêş de şirove bibin.

### a. Raweya RADERÎ

Rader, bêjeyeke lêkerî ye; bê alîkariya demê û kesan ramana kirin û bûyînê nîşan dike. Ji raderê lêker dertê. Rader wek navê mêza tê nasîn, û mîna yek bêjeyê bi hev ve tê nivîsîn.

*Nimûne:* Gotin, dîtin, danîn, reşkirin, lihevkirin…

Her raderek ji kokekê ku bi **<u>RA</u>** bi nav dibe û ji **<u>dawîneyeke raderî</u>** pêk tê.

Ji *Gotin:* Got = <u>RA</u> **ye.** **in = <u>Dawîne</u> ye.**

Ji *Çûn:* Çû = <u>RA</u> **ye.** **n = <u>Dawîne</u> ye.**

Di zimanê Kurdî de çar komên raderan hene:

***Sade** , **pêkhatî**, **hevdudanî** û **biwêjên lêkerî**.*

1. **Radera SADE**: Ji yek bêjeyê ye.

**Çûn , hatin…**

2.**Radera PÊKHATÎ**

Ji radereke sade û pêrkîtan tê çêkirin.

***Mînak* : <u>Hil</u>dan, <u>vê</u>ketin, <u>ve</u>kirin…**

3. **Radera HEVDUDANÎ**

Ji radereke sade û navdêr, rengdêr, cinav û hokeran tê çêkirin.

**<u>Av</u>rêtin, <u>sor</u>bûn, <u>pê</u>mayîn, <u>pêş</u>birîn, <u>lê</u>pirsîn <u>mat</u>mayîn.**

4. **Biwêja lêkerî**

Ji cure cure bêje, pêrkît, daçek, cinav… ku bi pêş radereke sade dikevin, tê saz kirin.

***Mînak:***

**Lêsiwarbûn, devjêberdan, perçeperçekirin…**

# HEYVA ŞÎNÊ Û ŞAHÎYÊ
# HEYVA HELEBÇE Û NEWROZÊ[1]

Bi hatina heyva Avdarê, gelê me yê Kurd serûber, bi çûk û mezinan, amadekariya pêşwaziya bêtirî cejnekê dike.

Li seranserî Kurdistanê û li derveyî welêt, ji bo me Kurdan, serê heft şahî û cejnan, cejna NEWROZê ye, û li serê heft şîn û bîranînan, reşgirêdana xişmûbêtara çekên kîmawî ku bi ser bajarê HELEBÇE de barî bûn, tê.

Newroz li rojhilata navîn, nemaze di herêma navbera çemên Dîcle û Ferêt de, ango li Kurdistanê tê hembêzkirin, ew ji gelê me yê Kurd re bûye şana serxwebûn û cejna azadî û aştiyê.

Lê mixabin, destlatên ku Kurdan hukum dikin, bi helwestên ne baş, û bi pozbilindiyeke kirêt li van cejn û bîranînên me dinêrin, û hîç nasnama me ya netewî napejrînin.

---

[1] .Nivîskar: Nivîskar: SÎNORÊ YEKTA, rojnama NEWROZ, hejmar(30)-2000

Gelê me yê Kurd rind têgihîştiye ku, lêxudîderketina cejna Newrozê, parastin û berxwedana di ber nasnama xwe ya netewî de ye, ji hebûna wî ya dîrokî re, navnîşana herî mezin, balkêş, bi wate û pîroz e.

Gava serkeftina KAWA, agirê serê çiyan û destpêka Buhara rengîn têkilhev dibin û li hev tên, hîngê Newroz çêdibe , jiyaneke mirovane ye nû pêk tê, û her Kurdek ji hinava dilê xwe de şa dibe û tê vejandin.

Vêca her sal li şeva 20- 21ê meha Avdarê, lawên gelê Kurd, bi vêxistina agiran li serê çiyan, bi xemlandina malên xwe bi mûm û feneran, bi lidarxistina komcivîn, mehrecan û semîneran, bi dahol û zurne, bi çepik û lîlî, bi awaz û stiran, hêviyan di ber dilan re dibin û tînin, şahiyên xwe bi coşeke mezin li dardixin û pakrewanên xwe yên nemir jî bi bîr tînin.

**RAHÊNAN li ser deqê**

1. *Yekejmarî û gelejmariya hin lêkeran diyar bike.*
2. *Nimûneyan li ser hersê demên lêkerê nîşan bide.*
3. *Li ser her texlîteke raderê nimûnakê destnîşan bike.*
4. *Wateyên van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

   **Coş, pakrewan, nemir, mixabin, destlat, komcivîn, vejandin, pêşwazî, nasname, awaz, helwest, parastin, xişmûbêtar.**

**SPARTIN**

1. *Sê kes di lêkerê de hene, wan bi nav bike, nîşandekên wan bi bîr wîne, û li ser her yekî hevokekê bide.*
2. *Van valahiyan dagire:*

   **Lêker bi kes û ……………xwe ve bi kirarê ve girêdayî ye. Eger kirar………… be, ew jî gelejmar e. Lê belê, ji rêzê der, lêkera ………………di dema borî de, ji aliyê durvê xwe ve bi ………… ve girêdayî ye.**

3. *Li ser her demeke lêkerê du hevokan wîne, bila di yekê de kirar yekejmar be, û di ya din de bireser gelejmar be.*

4. *Vekîta çewt ya van raderan rast bike, ya rast jî (R) li ber dîne:*

**Perçe perçekirin……………, hil hatin……………, rû niştin……………, jihev hezkirin………………, dan standin…………, ketin…………, sor kirin……**

5. *Bi alikariya radera sade (kirin), çend raderên pêkhatî û hevdudanî çêke.*

# KESANDINA LÊKERAN

Berî em derbas mijara kesandina lêkeran bibin, gerek e em zani bin ku di hemî cureyên lêkeran de, tenê lêkera raderî ya sade tê kesandin.

Wek nimûne, di van raderan de: (Hilkirin, , rabûn, lisazxistirin), guhertina kesandinê di koka lêkerên sade (kirin, bûn, xistin) de çêdibin.

C. Bedirxan demên lêkerê li gor RAya (koka) lêkerê, parve sê tofan kirine, di her tofekê de jî çend dem hene. Emê di waneyên li pêş me de, li ser demên her tofekê rawestin, raya wê nas bikin, deman bijmêrin û şêweya kesandina lêkerê diyar bikin.

# KESANDINA LÊKERAN
# DI DEMÊN TOFA YEKÊ DE

## A- Lêkera têneper(negerguhêz)

Demên vê tofê ev in :

1.Boriya borî.
2.Boriya dûdar.
3.Boriya berdest.
4.Boriya berdest a domdar.
5.Boriya berdest a bilanî.
6.Boriya hekînî (teşeya yekê).

Demên borî hemû li ser Rayeka lêkera borî tên kesandin. Derxistina wê **RA**yê ji raderê, bi tevahî, wiha pêk tê:

(( Nîşana raderê tê avêtin, çi ji raderê ma, ew **RA**ya demên borî ye )).

**Rader _ Nîşana raderê = Raya lêkera borî**

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Hatin** | **_** | **in** | **= Hat** |
| **Çûn** | **_** | **n** | **= Çû** |
| **Ketin** | **_** | **in** | **= Ket** |

**1.Boriya borî**

Ev dema nîşan dike, ku bûyînek yan kirinek berê (duh, pêr, pêrar, berî katjimêrekê…) hatiye kirin û derbas bûye.

Dema boriya borî li gor vê rêzikê tê sazkirin:

Ra+ Nîşana kesan

Wek me berê jî goti bû, nîşanên kesan jî ev in:

***Kesê yekê:*** im. ***Kesê diduyê :*** î. ***Kesê sisiyê:*** e.

Gelejmara ***hersê kesan***: in.

***Nimûne :***

Ji (ketin): **RA** (ket) e.

***Y. Jimar :*** **Ez ketim.Tu ketî. Ew ket.**

***G. Jimar :*** **Em, win, ew ketin.**

Bi tevahî, nîşana kesê sisyan (e) netê xebitandin.

**-** Teşeya **NEYÎNÎ:** Ez… ne ketim…

**2. Boriya dûdar**

Ev dema xuya dike ku, bûyînek yan kirinek berê hatiye kirin, lê akama wê hîn li ber çavan e.

Ev dema bi vê şêweyê tê sazkirin:

Ra + N.Kesan + e.

Yanê di vê demê de, tenê (e) li nîşana kesên dema boriya borî zêde dibe.

***Nimûne***: *Ketin*.

***Y.Jimar*: Ez ketim<u>e</u>. Tu ketiy<u>e</u>. Ew ketiy<u>e</u>.**

***G.Jimar* : Em, win, ew ketin<u>e</u>.**

**- Teşeya NEYÎNÎ:**

**Ez… <u>ne</u> ketime…**

## 3. Boriya berdest

Ev dema nîşan dike ku, kirinek an bûyînek di nav katijimêrekê, rojekê, heftekê, mehekê, salekê yan jî di nav çend salan de dibû û dihate kirin. Ango dirêjahî û dubarekirina bûyînê di boriyê de destnîşan dike.

Dema boriya berdest bi vî awayî tê sazkirin:

<u>Berlêker (di) + Ra + N.kesan.</u>

***Nimûne :*** *Ketin*.

**Y.*Jimar* : Ez diketim. Tu diketî. Ew diket.**

***G.Jimar* : Em, hûn, ew diketin.**

**- Teşeya NEYÎNÎ:**

**Ez… ne diketim…**

## 4. Boriya berdest a domdar

Ev dema destnîşan dike ku, kirinek an bûyînek di kurtedemeke boriyê ye navbirî de dihate kirin. Ev dema pir bikar netê.

**Ez <u>diçûme</u> mal gava min tu dîtî.**

Rêzika sazkirina vê demê wiha ye:

<u>Berlêker(di) + Ra + N.kesan + e</u>.

***Nimûne :*** *Çûn.*

**Ez diçûme.** **Tu <u>di</u>çûye.** **Ew <u>di</u>çûye**

**Em, hûn, ew <u>di</u>çûne.**

**- Teşeya NEYÎNÎ:** **Ez… <u>ne</u> diçûme…**

## 5. Boriya berdest a bilanî

Ev dema lavij û xwaziyê diyar dike. Bi gelemperî, bi alavên mîna (Eger, bila, ku, da ku, xwazî, kêşka) re tê.

Rêzika sazkirina vê demê wiha ye:

<u>Berlêker (bi) + Ra + N. kesan</u>.

Nîşanên kesên vê raweyê, ev in:

- ***Kesê yekê:*** AMA.
- ***Kesê diduyê:*** AYÎ(AYA).
- ***Kesê sisiyê:*** AYA(A).
- ***G.Jimara hersê kesan:*** ANA.

***Nimûne :*** *Ketin.*

**Bila ez biketama.** **Xwazî tu biketayî.**

**Daku ew biketaya (biketa).**

**Kêşka em, hûn, ew biketana.**

**- Teşeya NEYÎNÎ:** **Ez… neketama…**

- Lêkera pêkhatî li vê demê, berlêker (bi) nastîne û alava neyîniyê (ne) dikeve navbera pêrkîtê û raya lêkerê.

*Nimûne*: **Vêketin: Ewê vêketa..... ewê vêneketa.**

**6. Boriya hekînî:** Ev dema nîşan dike ku bûyîn an kirinek, bi bûyîn û kirineke din ve girêdayî ye. Ew bi boriya berdest a bilanî re bikar tê.

**Eger min xwe negirtaya** (*boriya berdest a bilanî),* **ez dê biketama** (*boriya hekînî*).

Ev dema mîna dema boriya berdest a bilanî tê sazkirn, tenê pirtika (dê) dikeve navbera lêker û kirarê.

***Nimûne :*** *Ketin.*

**Ez dê biketama.** **Tu dê biketayî(ya).**

**Ew dê biketaya (biketa ).**

**Em , hûn, ew dê biketana**.

Eger kirarê lêker cinavekî kesîn be, em kanin ji dêvla (dê) tîpa (ê) bi dawiya wî xin.

***Nimûne*** *: Ketin*.

**Ew dê biketa …… Ewê biketa.**

Lê gava kirar navdêrek be, gereke (dê) cuda were nivîsîn.

**Bangîn dê biketa.**

**- Teşeya NEYÎNÎ:**

**Ezê… neketama…**

- Lêkera pêkhatî li vê demê de, berlêker (bi) nastîne û alava neyîniyê (ne) dikeve navbera pêrkîtê û rya lêkerê.

***Nimûne*****: Raketin: Ewê raketa..... ewê raneketa.**

## • Kesandina lêkera BÛNê di demên borî de

Lêkera bûnê mîna lêkera ku raya wê bi (û) kuta dibe tê kesandin. RAya wê di demên borî de (Bû) ye. Lê li gor cihê lêkerê di hevokê de ew du wateyan dide:

- Eger ew li dû seredanî were, wateya bûyînê dide.

Wata bûyînê: **Rengîn mamoste bû.**

- Lê eger lêkera bûnê di navbera serwer û seredanî de were, wateya guhertinê dide.

Wata guhertinê: **Rengîn bû mamoste.**

## • Teşeya NEYÎNÎ di demên borî de:

- Me dît ku teşeya neyînî ya vê tofê bi alîkariya alava neyîniyê (ne) tê çêkirin. Di demên (1, 2, 3 û 4) de, ew li pêş lêkerê cihê tê nivîsîn. Û di demên (5 û 6) de, şûna berlêker (bi) digre û bi lêkerê dikeve. *(Li nimûneyên jorîn vegere).*

- Di lêkerên pêkhatî de, berlêker û alava neyîniyê dikevin navbera koka lêkerî û pêrkîtê.

***Herwekî:*** **Hildiketim, hilbiketama, hilbikevim.**

**Ez hilketim. Ez hilneketim.**

# DAYÎK[1]

Dûmeqeskekê li bin bana xaniyê me hêlîna (malik) xwe çêkir bû. Her sal, payîzê ew difirî diçû, buharê disa vedigerî dihat û dikete hêlîna xwe.

Dema buhar dihat, dilê me jî vedibû. Gava dûmeqeskê li ber pencera me çivçiv dikir, şahî dikete nav me, û em kêfxweş dibûn.

Buharekê, ew dîsa hat, hêk kirin û çêlçûk (çêlik, çûçûk) deranîn û ji sibê ra hêvarê ewê bi şahî dikir çîvçîv û çêlçûkên xwe dan dikir. Çêlikan jî bi şahî serên xwe ji hêlînê derdixistin nikilên xwe dirêj dikirin û bi dayîka xwe re şa dibûn.

Rojekê nizanim ji ber çi bû, çêlçûkekê serê xwe ji hêlînê derxist, xwe dirêj kir û kete xwar. Dayîkê kire çîvtîn û xwe li pê avêt. Lê li wê çaxê nizanim ji kîderê pisîkek derket, bazda û çêlçûk girt. Wê demê dûmeqeskê bi dengekî zîz kire

1. QANATÊ KURDO- Bi kurtahî, ji pirtûka : ((Zimanê Kurdî, rêziman)).

çivçiv, çivtîna xwe dirêj kir û da dû pisîkê, li dorê firî, û nikilê xwe lê da, xwast çêlçûka xwe ji nav lepên pisîkê derxe, lê pisîkê lezand û çû xwe xiste binê embarê. Dûmeqeskê dîsan bi dengekî dirêj kir çîvçîv û li dora embarê firî. Me jî ji hêla xwe de darikek li wir bû di binê embarê re bir û anî lê bê sûd bû. Pir ne çû pisîk ji bin embarê derket, devê xwe alast, û ber bi kadînê ve revî.

Gava dûmeqeskê pisîk bê çêlçûk dît, bi dengekî bi şewat kire çîvçîv û firî çû ser darê, piştî bihinkekê ji nişkave mîna kevirekî ji ser darê de kete ser zemînê, em bi lez bezîn ser, me dît ku ew bûye termekî bê giyan, ji şewata çêlçûka xwe re bihecî û mir.

Ev bûyer êvareke buharê bû. Gelek sal di ser re derbas bûne, lê ez wê ji bîr nakim, cara yekê bû ez pê hestiyar dibûm, ku dûmeqesk jî dayîkek e mîna dayîka me, dilê wê jî mîna dilê dayîka me ye, çawa dayîkên me xwe dikin qurbana me, wisan ew jî xwe dikin qurbana çêlçûkên xwe.

Dayîk şêrîn e, qedra dayîka xwe zanibin, şîrê dayîka xwe ji bîr mekin.

**RAHÊNAN li ser deqê**

*1. li ser her demeke borî nimûnakê derxîne.*

*2. Nimûnan li ser kesandina lêkera bûnê destnîşan bike.*

*3. Nimûnan li ser teşeya neyîniya demên borî, destnîşan bike.*

*4 . Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Kadîn, zemîn, bûyer, hestiyar, term, bihecî.**

**SPARTIN**

*1. Raya demên borî ji van raderan derîne.*

**Bezandin………,vekirin ………, man………, jihevhezkirin……, nalîn…………, veqetandin……….**

*2. Van nîşanên kesan li ber demên wan dîne:*

*IM, E, Î, IME, IYE, INE, AMA, AYÎ, AYA, ANA.*

- **Boriya borî û B.Berdest: …………………**
    - **B.Dûdar û B.Berdest a domdar: ………………**
    - **B.Berdest a bilanî û B. Hekînî: ………………**

*3.Nîşana her demeke lêkerê ji stûnê yekê li ber wateya wê ya rast dîne.*

**a- B.Borî:** …**Karek di kurtedemeke boriyê ye navbirî de dihate kirin.**

**b- B. Berdest:** …**Lavijê jî destnîşan dike.**

**c- B.Dûdar:** …**Karek bûye û derbas bûye.**

**ç- B.Berdest a domdar:** …**Kark berê bûye lê akama wî hîn heye.**

**d- B.Berdest a bilanî:** …**Bûyîna karekî bi bûyîna karekî din ve girêdayî ye.**

**e- Boriya hekînî:** …**Dirêjiya kirin û bûyînê di boriyê de xuyan dike.**

4. *Rêzika sazkirina her demeke borî binivîse, û hevokekê li ser her demekê bide.*

5. *Teşeya neyînî ya demên borî, bikaranîna daçeka neyîniyê …… saz dibe. Du nimûneyan wîne, yekê berlêker di lêkerê de hebe, û yek bê berlêker be.*

6. *Van lêkeran di teşeya neyîniyê de binivîse:*

 **Vekir…………, hilgirtin…………,**

 **bada……………, biçûya…………, barkir…………,**

 **rûnişt…………, dihat………… ,**

 **lihevxistin…………, xwend…….**

7. *Du nimûnan li ser lêkera bûnê binivîse, yek wateya bûnê bide, ya din jî ya guhertinê.*

## VEGUHASTINA LÊKERÊN TÊNEPER..
## Di demên hevedudanî de

Demên vê tofê bi alêkariya lêkera BÛN çêdibin. Lêkera bingehîn di raweya çêbiwarî de tê û veguhastin jî li ser lêkera alîkar BÛN çêdibin.

***Nimûne***:

*Em hati bûn.* *Tu rûnişti bûyî.*

*Ew ma bû.* *Win revî bûn.*

Di van hevokan de (hati, rûniştî, ma, revî) çêbiwar in.

- ## Raweya çêbiwar:

Du cureyên çêbiwarê hene:

A. **Yekem**: Dawîneyên raderî (in, n) ji raderê tên avêtin û tîpa (î) dikeve şûnê.

***Nimûne***: *Hatin – hatî (hatî vegerî). Ketin- ketî (me ketî rakir).* *Man- mayî.* *Dayîn- dayî.* *Çûyîn- çûyî.* *Bûn- bûyî.*

B. **Diwem**: Tîpa (n) ji dawîneya raderî tê avêtin.

***Nimûne***: *Hatin- hati.* *Mirin- miri.* *Man- ma.* *Çûn-cû.* *Bûn- bû.* *Ketin- kati.*

Ev cureyê diwemîn bi tenê netê dîtin, ew tenê ji bo kesandina demên hevedudanî re tê xebitandin.

- **Demên hevedidanî**

Çar demên hevedudanî yên sereke hene:

**a. Boriya çêrokî**: Ew bi alîkariya raya dema borî ya lêkera bûn çêdibe.

***Nimûne***: Ketin

| | |
|---|---|
| *Ez keti bûm* | *tu keti bûyî* |
| *Ew keti bû* | *win keti bûn* |

**b.** Boriya bilanî: Li ser raya raweya fermanî (b) a lêkera BÛN radibe.

***Nimûne***: Çûn

| | |
|---|---|
| *(Bila) ez çû bim* | *(Bila) tu çû bî* |
| *(Bila) ew çû be* | *(Bila) ew çû bin* |

**c. Boriya berdest a bilanî**: Li ser raya dema borî (bû) ya lêkera BÛN çêdibe, û nişandekên kasîn (ama, ayî, aya, ana) bi dawîiyê dikeve.

***Nimûne***: Meşîn

*(Bila) ez meşî bûyama (biwama)*
*(Bila) tu meşî biwayî*
*(Bila) ew meşî biwa*
*(Bila) win meşî biwana*

**d. Boriya hekînî**: Tenê alava (dê) li raweya dema boriya bilanî zêde dibe.

***Nimûne***: Meşîn

*Ezê (dê) meşî bûyama (biwama)*
*Tuyê (dê) meşî biwayî*
*Ewê (dê) meşî biwa*
*Winê (dê) meşî biwana.*

## • Teşeya NEYÎNÎ ya tofa hevdidanî

Teşeya neyînî ya demên tofa hevdidanî bi alîkariya alava neyîniyê (ne) tê çêkirin. Alava (ne) li pêş çêbiwarê cuda tê nivîsandin.

| | |
|---|---|
| ***Ez keti bûm.*** | ***Ez ne keti bûm.*** |
| ***Ezê keti bim*** | ***Ezê ne keti bim.*** |
| ***Ez keti biwama.*** | ***Ez ne keti biwama.*** |
| ***Ezê keti biwama*** | ***Ezê ne keti biwama.*** |

Lê di lêkerên pêkhatî de alava neyîniyê (ne) dikeve paş pêrkît:

| | |
|---|---|
| ***Ez rûnişti bûm.*** | ***Ez rûneništi bûm.*** |
| ***Ezê rûnişti bim*** | ***Ezê rûnenişti bim.*** |
| ***Ez rûnişti biwama.*** | ***Ez rûnenişti biwama.*** |
| ***Ezê rûnişti biwama*** | ***Ezê rûnenişti biwama.*** |

# KESANDINA LÊKERA TÊPER(gerguhêz)
## Di demên tofa yekê de

Lêkerên têper, ên sade û hevdudanî, di demên borî de, ji aliyê kes û mêjerê ve bi biresera xwe ve tên girêdan.

| ***Bireser Y. Jimar*** | ***Bireser G. Jimar*** |
| --- | --- |
| **Azêd ez dîtim, dîti bûm.** | **Azêd em dîtin, dîti bûn.** |
| **Azêd tu dîtî, dîti bûyî.** | **Azêd win dîtin, dîti bûn.** |
| **Azêd  ew dît, dîti bû.** | **Azêd ew dîtin, dîti bûn.** |

Lê gava ku biresera ne durust bi lêkerê têper re hati be, yan bireser ne hati be, ew di hemî demên boriyê de, li gor durva kesê sisiyan yê yekejmar tê kesandin.

| ***Bireser ne durust e*** | ***Bireser ne standiye*** |
| --- | --- |
| **Min, te, wî bi piyalê vexwar.** | **Min, te, wî vexwar.** |
| **Me, we, wan bi piyalê vexwar.** | **Me, we, wan,vexwar.** |

Wekî ku xuya dibe, bi lêkera têper re cinavên kesîn yên tewandî wek kirar têne xebitandin.

# EHMEDÊ XANÎ[1]

Ehmedê Xanî helbestvanê Kurdan e, nav û dengê wî li cihanê belav bûye. Lê mixabin ne diyar e ku ew di kîjan salê de ji dayîka xwe bûye. Lê diyar e ku wî destana xwe ((Mem û Zîn)) di çerxê hevdehan de nivîsiye. Ehmedê Xanî ji hoza Xanî ye, ew di wê demê de li derdora bajarê Beyazîdê ciwar dibû.

Wê hîngê Kurdistan hatibû du parkirin, parek jê ketibû bin destê siltanê Osmanî, para din jî ketibû bin destê şahê Îranê.

Wî li ser rewşa gelê Kurd ya wî hîngê wiha digot:

*Kurmanc di dewleta dinê da*

*Aya bi çi wechî mane mehrûm ?*

*Bilcimle ji bo çi bûne mehkûm ?*

lê li wan her du parên Kurdistanê mîritiyên Kurdan hebûn. Li Beyazîdê jî mîritiyeke Kurdan

---

1- QANATÊ KURDO-Bi kurtahî ji pirtûka wî: ((Zimanê Kurdî)).

ya serbixwe hebû, E. Xanî di sersiya wê de dijî û dixebitî.

E. Xanî rind bi zimanên Erebî, Farisî û Tirkî zanî bû, û wêjeya wan gelên Rojhilata Nêzîk jî zanî bû. Ji bilî wê, wî nivîsarên helbestvanên Kurd ên berî wê demê, wek Elî Herîrî, Meleyê Cizîrî û Feqê Teyran jî baş zanî bû.

Dema ku E. Xanî li Beyazîdê bû, didît çawa axe, beg û mîrên Kurdan li ser axa xwe destlatdar bûn. Lê mixabin ew ne yek bûn, li hember hev radibûn, bi hev re şer dikirin, şêniyê mîritiyên xwe ne didan xwendin, hêzên xwe ne dikirin yek, da li dijî vegirtiyên Kurdistanê û serxwebûna gelê Kurd şer bikin.

E. Xanî ev tiştên han baş zanî bûn, wî bi dil û can dixwest miletê xwe ji tariyê derxe bîne ser riya ronahî û rastiyê. Lewre li Bazîdê dibistan û mizgeft ji kîsê xwe vekiribûn, û bi xwe ders didan zaroyên Kurdan. Wî dixwest ew bi zimanê xwe bixwînin û qedra zimanê xwe bizani bin.

Ewî haj hêza netewa Kurd hebû, wî rind zanî bû ku li nav gel, gelek mêrxas, qereman û

dilewer hene, di nivîsarên xwe de dinivîsî û digot ku her mêrekî Kurd, her mîrekî Kurd mîna Rustmê Zal in, lê mixabin ew tev bêtifaq in, her yek ji wan xulamtiyê ji siltanê Osmanî û şahê Îranê re dike, ewî dixwest hemû Kurd bona azadbûn û serxwebûna xwe yek bin.

E. Xanî destana xwe (( Mem û Zîn )) ji rewşa gelê xwe yê kurd wergitiye û nivîsandiye. Wî li ser rewşa gelê xwe wiha digot :

*Ger dê me hebûya itîfaqek*
*Vêkra me bikira inqiyadek*

Yanê, eger yekîtiya me hebûya, meyê sazûmanek danîbûya.

**RAHÊNAN li ser deqê**

*1. Nimûnan li ser demên tofa hevdudanî derîne.*

*2. Nimûnan li ser teşeya neyîniyê xuya bike.*

*3. Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

*1. Çend nimûnan li ser kesandina lêkerên têper di deqê de destnîşan bike.*

**Destan, helbestvan, hoz, şênî, vegirtin, dilewer, netew.**

**SPARTIN**

*1. Çawa (RA)ya tofa demên tofa hevdudanî çêdibe ?*

*2 . Demên lêkerên van hevokan li bogirê binivîse.*

| | |
|---|---|
| **Hûn rabû bûn ……** | **Tu hati bû ……** |
| **Ez bi ser keti bim ……** | **Ew revî bin ……** |
| **Tuyê windabû bî……** | **Hûnê ji hev qetî bin……** |
| **Ew keti bûyana……** | **Ez keti bûyama……** |
| **Ezê keti bûyama……** | **Hûnê çû bûyana……** |

*3. Raweyên lêkerên demên hevdudanî bijimêre, û li ser her yekê du nimûnan wîne, yekejmar û geleljimar.*

*4. Di demên hevdudanî de, nimûnakê li ser lêkera bûnê di her raweyekê de wîne.*

*5. Çawa neyîniya tofa demên hevdudanî tê çêkirin ? nimûneyan wîne.*

# KESANDINA LÊKERAN
## di demên niha, wêbê û raweya fermanî de

Lêkerên demên vê tofê yên têper û têneper mîna hev tên kesandin. Ew ji aliyê kes û mêjerê ve bi kirarê ve tên girêdan.

Lêkerên vê tofê li ser bingeha raya fermanî tên avakirin.
Bi tevahî, raya fermanî bi van gavan ji raderê dertê:

1. Nîşana raderî (in , n) û tîpa berî wê ji dawiya raderê tê xistin û çi ji ber ma ew raya fermanî ye.

*Nimûne*: çûn: bi-**ç**-e. Kirin: bi-**k**-e. Kirîn: bi-**kir**-e. Rabûn: **rab**-e.

- Eger tîpa (a) di kîta dawiya rayê de hebe, bi (ê) tê guhertin.

Sp**a**rtin: bi-sp**ê**-r. Al**a**stin: bi-al**ê**s-e.

2. Eger rader bi dawîneya (andin) pêk hati be, ew bi (în) tê guhertin.

*Nimûne*: xw**andin**: bixw**în**e. Revandin: birev**în**e. Hilweş**andin**: hilweş**în**e.

3. Ji bilî lêkerên rêzder ên naskirî: Gotin- bêje, hatin- were, hejmarek ji raderan ji rêzikên jorin revîne û rêzder bûne. *Wek*:

Raderên bi (iştin, istin) kuta dibin: Êxistin- biêxe, rûniştin- rûne, veniştin- vene.

Demên vê tofê ev in:

1. Nihoya pêşker. 2. Nihoya domdar.
3. Wêbê. 4.Nihoya bilanî. 5. Raweya fermanî.

**1. Nihoya pêşkerî**

Ev dema xuya dike, ku bûyînek an kirinek di dema axaftinê de dibe.

Ew bi vî awayî saz dibe:

Berlêker(di) + RAya demên niho,wêbê û raweya fermanî + N.Kesan (im, î, e, in).

***Nimûne :*** Ketin

Raya ketin a demên vê tofê **KEV** ye.

**Ez dikevim. Tu dikevî. Ew dikeve.**

**Em, win, ew dikevin(1).**

Eger tîpa lêkerê ya yekê dengdêrek be, hîngê berlêker (di) dengdêra xwe winda dike.

---

1. Ji van nimûnan diyar dibe ku tipên mîna: (v, j, ş ) di koka kevin ya binyata wan bêjeyan de heye, di raweya raderê de jê hatin êxistin, lê gava dibin lêker, kes û deman dibin û tên kesandin, serkînûve serê xwe hildidin û derdikevin. Wek: ketin, koka kevin (kevtin) e. Dotin, koka xwe (doştin) e. Avêtin, koka xwe (avêjtin) e.

**Di-êşim … Dêşim.**

**2. Nihoya domdar**

Ev dema nîşan dike ku bûyînek an kirinek berê dibû û hîn dibe û tê kirin û dirêj dibe.

Ev dema li gor vê rêzikê çêdibe:

Berlêker(di) + Ra + N.Kesan + e.

Ango tenê tîpa (e) li nîşana kesên nihoya pêşkerî zêde dibe.

***Nimûne :*** *Ketin*

**Ez dikevime. Tu dikeviye. Ew dikeveye**

**Em, hûn, ew dikevine.**

- Raweya **NEYÎNÎ** ya nihoya pêşkerî û nihoya domdar:

Alava neyîniyê (**na**) dikeve şûna berlêker.

***Nihoya pêşkerî :*** **Ez dişom, ez naşom.**

***Nihoya domdar :*** **Ez dişome, ez naşome.**

**3. Nihoya bilanî**

Ev dema daxwez û lavijê nîşan dike. Bi awakî gelemper, ev dema bi alavên mîna: Bila, da ku, ku, xwezî, eger û kêşka re pêk tê. Raweya vê demê bi vê şêweyê tê hûnandin:

Berlêker(bi) + Ra + N.kesan

***Nimûne*** **:** *Ketin*

**Bila ez bikevim. Bila Tu bikevî. Bila Ew bikeve.**

**Da ku em, hûn, ew bikevin.**

**- NEYÎNIYA** nihoya bilanî:

Bi danîna daçek (ne) li şûna berlêker (bi) saz dibe.

**Bila ez bişom .** **Bila ez <u>ne</u>şom.**

**Bila ew bikeve.** **Bila ew <u>ne</u>keve.**

- Di lêkera pêkhatî ya vê demê de, berlêker (bi) netê xebitandin, û alavên neyîniyê (ne) dikeve navbera pêrkît û rya lêkerê.

***Nimûne*****: Ewê raketa..... ewê raneketa.**

## 4. Dema wêbê

Ev dema nîşan dike ku bûyînek an kirinek dê di paşerojê de (siba, dusiba, mehekê an saleke din…) were kirin.

Dema wêbê bi danîna pirtika (dê) li pêşiya lêkera nihoya bilanî tê sazkirin.

***Nimûne :*** *Ketin*

**Ez dê (Ezê) bikevim.** **Tu dê (Tiwê) bikevî.**

**Ew dê (ewê) bikeve**

**Em, hûn, ew dê (Ewê) bikevin.**

Gava kirar navek be, (dê) wek xwe dimîne û bi serê xwe tê nivîsîn. Lê eger ew cinav be (ê) pêve têye nivîsandin.

**- Teşeya NEYÎNÎ:**

**Ezê… <u>ne</u>kevim…**

Ango daçek (ne) şûna berlêker digire.

**<u>Têbînin giştî</u> :**

- Di lêkera pêkhatî ya vê tofê de, berlêker (di) û alavên neyîniyê (na) dikevin navbera pêrkîtê û koka lêkerê.

**Ez hil<u>di</u>kevim.** **Ez hil<u>na</u>kevim.**

- Di lêkera pêkhatî ya vê tofê de, di raweyên fermanî, bilanî û wêbê de berlêker (bi) nayê xebitandin, alavên neyîniyê (ne) jî dikevin navbera pêrkît û koka lêkerê.

**Ez hilkevim.** **Ez hil<u>ne</u>kevim.**

**Ezê Hilkevim.** **Ezê …hil<u>ne</u>kevim.**

**5. Raweya fermanî**

Di kurmancî de, fermanî tenê ji bo kesê diduyê (tu, hûn) heye. Fermanî bi vî awayî çêdibe:

<u>Berlêker (Bi) + ra + N.Kesan</u>

Nîşanên kesan di fermaniyê de ev in:

**E : Ji kesê diduyan yê *yekejmar re*.**

**IN : Ji kesê diduyan yê *gelejmar re*.**

***Nimûne* :** *Ketin*

**Tu bikeve.** **Hûn bikevin.**

**- Teşeya NEYÎNÎ ya fermaniyê :**

Bi alîkariya daçek (me) çêdibe, ew dikeve şûna berlêker (bi).

**Bireve … <u>me</u>reve.** **Birevin … <u>me</u>revin.**

**<u>Têbîn:</u>**

**1.** Eger tîpa dawiya raya lêkerê dengdêrek be, hîngê dawîneya fermaniyê ya yekejmarînê (e) netê xebitandin, ya gelejmarînê (in) jî dibe (n).

Bajo Bojo<u>n</u>

**2.** Eger raya lêkerê bi dengdêrekê dest pê bike, berlêker (bi) dengdêra xwe winda dike.

**Biaxive … Baxive.**

**3.** Eger lêker pêkhatî be, berlêker (bi) nayê xebitandin.

**Hilgire. Rabe. Rûne.**

# RABÛN Û RÛNIŞTIN[1]

Keç û xort, mirovên me, gelek bi edeb in. Rabûnrûniştin û danûstandina wan bi rêz û terbiyat in. Ew nazik, giran û ciwanmerd in. Paşgotina heval, hogir û biraderên xwe nakin. Dostê dostê xwe ne. Pir naxivin, gotina xwe bê rêdan û dirêj nakin. Gava ew erê dibêjin, erê ye, û gava na dibêjin na ye. Ew beriya ku tiştekî dibêjin, wî xweş didine hişê xwe, û paşê ji gotina xwe venagerin. Eger sozekî bidin, bi dilxweşî û camêrî sozê xwe tînin cih. Dema karek ji wan tê xwestin, nabêjin ê emê bikin, radibin û wek tê xwestin dikin.

Gava ji kesekî tiştekî dixwezin, nabêjin ((bide min!)), dibêjin: (( Ji kerema xwe bide min)). Ku ji wan re tiştek hat dan ((spas)) dibêjin û minetdariya xwe didin zanîn. Ku kesekî banî wan kir, ew: ((Bifermo, an ezbenî)) dibêjin. Gava kesek tiştekî jî dipirse, ew lê vedigerînin: ((Ez

---

1. Bi kurtahî ji pirtûka: (( Fêrbûna xwendina Kurdî)), KAMÎRAN BEDIRXAN.

dizanim, an nizanim, an erê, an belê )), lê nabêjin: ((Hi, ha)) û serê xwe nahejînin, ew dizanin, ku wilo kir kêmasiyek e.

Dema ew tiştekî vedixun bi usûl vedixun, û bi edeb dikşînin, deng dernaxin. Gava li ser xwerinê û parî di devê wan de be, milçemilç û çelqeçelq nakin.

Eger ew dipeyîvin, dengê xwe bilind nakin, û heke yek dipeyîve, gotina wî nabirin û dest bi peyvê nakin û hevalên dora xwe aciz nakin. Her rastiyê dibêjin, derewan nakin, ew dizanin ku derew sêwî ne.

Mirovê perwerde bûye, dest û tiliyên xwe nakin dev, bêfil û guhên xwe û wan paqij nakin. Gava ew dikuxin an dibênijin, destê xwe an destmala xwe didin ber devê xwe.

Ew tif ser xakê nakin. Ariya cixara xwe di nav civatê de naweşînin erdê.

Li zaroyên xwe nadin, wan bê sedemeke giran nêşînin, wan tirsandî û çavşikênandî nakin. Ew dizanin, ku heke wan wilo kir, pê derewker dibin.

Çiqas bixeyîdin, gotin û pirsên xirab ji tu kesî re nabêjin, û ji kûr ve wan birîndar nakin. Ew dizanin, ku birîna xenceran sax dibe, lê birîna gotinan sax nabe.

Gava ji wan tiştek tê pirsîn, xweş bala xwe didinê, daku bikarin bi rastî bersiva wî bidin.

Dema kesek ji wan re tiştekî dibêje, bi bînferehî guh didinê û bi lez nabêjin: ((Ez dizanim, an min bihîst)). Bi bala fireh hêj mirov çêtir hîn dibe.

Ew dizanin ku enirîn û bihintengî tiştên ne qenc in, nemaze li ber merivên qels, belengaz û zaroyan, û dilşikestandina wan kêmasiyek e, û şermezariyeke zor gewre ye.

Çavsoriya xwe li ser zordaran û li yên di ser xwe re dikin , ne li yên di bin xwe re, ne li yên kêmî xwe.

## RAHÊNAN li ser deqê

1. *Li ser her demeke lêkera demên niho,wêbê û raweya fermanî nimûnakê destnîşan bike.*
2. *Çend teşeyên neyîniyê ji demên niho,wêbê û raweya fermanî xuya bike.*
3. *Wateya van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Şermezarî, gewre, enirî, zordar, spas, fermo, ez benî.**

## SPARTIN

1. *Bi gelemperî, çawa (RA) ya lêkerên demên niho,wêbê û raweya fermanî ji raderên xwe dertîn. Nimûnekê wîne û şirove bike.*
2. *Nîşana dema lêkerê ji stûnê yekê, li ber wateya wê ya rast ji stûnê didiwan dîne.*

**a- Nihoya pêşkerî: …Karek niha dibe û kuta ne bûye.**
**b- N.dirêj : …Karek di dema axaftinê de dibe.**
**c- N. bilanî: …Karek dê paşê were kirin.**
**ç- Wêbê: …daxwazê diyar dike.**

3. *Rêzika sazkirirna lêkerên demên niho, wêbê û raweya fermanî binivîse, nimûnekê li ser her yekê wîne, û teşeya wan ya neyîniyê jî xuya bike.*
4. *Van lêkeran di raweya fermanî de binivîse, û li ser her yekê hevokekê saz bike:*

**Lişûnmayîn, vêketin, anîn.**

# KESANDINA LÊKERA (BÛN)
## di demên tofa diduyê de (niho, wêbê û fermanî)

Li gor rêzika bingehîn, **RA**ya demên lêkera bûnê ya vê tofê (b) ye. Bitevahî lêkera bûnê di vê tofê de du teşeyan distîne û du wateyan dide (bûyîn û guhertin). Lê belê ew di teşeya yekê ya dema nihoya pêşkerî de durvên cuda distîne.

**1.Dema nihoya pêşkerî**

**A.**Teşeya **-I- bûyînê**:

Di vê teşeyê de lêkera bûnê li gor kes û mêjerê, durvên têvel distîne.

***Kesê yekem:*** **Ez jîr im**

***Kesê diwem:*** **Tu jîr î**

***Kesê sêyem:*** **Ew jîr e**

***G.Jimara hersê Kesan:*** **Em, hûn, ew jîr in.**

Ji nimûnan xuya dibe ku rêzika sazkirinê wiha ye:

Serwer(kirar), seredanî (bireser), durva lêkera bûnê ya teşeya yekê (im, î, e, in).

Eger tîpa dawiya seredanî dengdêrek be, lêkera bûnê di kesê yekê de dibe ( me), û di geljimariyê de dibe (ne), û di kesê yekê û diduyê de tîpa girêkok (y) pê ve dibe.

**Ez gundî *me*. Tu gundî *yî.* Ew gundî *ye.***

**Em, hûn, ew gundî *ne*.**

**- NEYÎNIYA** teşeya **-I-**:

Ew bi alîkariya alava neyîniyê (ne) tê çêkirin. Lê belê:

- Eger seredanî hebe, (ne) li pêşiya wî tê.

**Ez *ne* dirêj im Ew *ne* dirêj in.**

- Eger seredanî tune be, (ne) li pêşiya serwerê tê.

***Ne* ez im. *Ne* hûn in.**

**B .** Teşeya **-II- guhertinê** :

**Ez *dibim* jîr. Tu *dibî* jîr. Ew *dibe* jîr.**

**Em, hûn, ew *dibin* jîr.**

Ji nimûnan xuya dibe ku rêzika sazkirinê wiha ye:

<u>Serwer, berlêker (di) + ra (b) + N.Kesan(im, î, e, in), seredanî.</u>

**- NEYÎNÎ**

Bi karanîna alava (na) li şûna berlêker (di) çêdibe.

| | |
|---|---|
| **Ez dibim jîr.** | **Ez <u>na</u>bim jîr.** |
| **Tu dibî jîr.** | **Tu <u>na</u>bî jîr.** |
| **Ew dibe jîr.** | **Ew <u>na</u>be jîr.** |
| **Em, hûn, ew dibin jîr.** | **<u>Na</u>bin jîr.** |

**2 . Nihoya bilanî**

**A** . Teşeya **-I-bûyînê**.

**Bila ez mamoste bim. Bila tu mamoste bî. Bila ew mamoste be. Em, hûn, ew mamoste bin.**

Rêzika sazkirinê wiha ye:

<u>Serwer, seredanî, ra (b) + N.Kesan</u>

**- NEYÎNÎ:**

Bi alîkariya alava (ne) li pêş seredanî çêdibe.

**Ez *ne* dirêj bim ….**

**B .** Teşeya **-II- guhertinê** (*berlêker "bi" distîne*).

**Bila ez bibim mamoste. Bila tu bibî mamoste.**

**Bila ew bibe mamoste.**

**Bila tu, em, hûn, ew bibin mamoste.**

Rêzika sazkirinê wiha ye:

Serwer, berlêker(bi)+ra(b)+N.Kesan, seredanî.

**- NEYÎNÎ**:

Daçek (ne) dikeve şûna berlêker (bi).

**Ez nebim mamoste.**

**3.Wêbê**

**A**. Teşeya **-I-**.

**Ez dê (Ezê) mamoste bim.**

**Tu dê (Tiwê) mamoste bî.**

**Ew dê (Ewê) mamoste be.**

**Em(ê), hûn(ê), ew(ê) dê mamoste bin.**

Rêzika sazkirinê wiha ye :

Serwer, dê, seredanî, ra(b) + N.Kesan.

**- Rawa NEYÎNÎ:**

Bi karanîna alava (ne) li pêş seredanî tê çêkirin.

**Ezê ne mamoste bim.**

**Tu dê ne (Tiwê) mamoste bî.**

**Ew dê ne (Ewê) mamoste be.**

**Em(ê), hûn(ê), ew(ê) dê ne mamoste bin.**

**B**. Teşeya **-II-**: (*berlêker "bi" distîne*).

**Ez dê (ezê) bibim mamoste.**

**Tu dê (tiwê) bibî mamoste.**

**Ew dê (ewê) bibe mamoste.**

**Em(ê), hûn(ê), ew(ê) dê bibin mamoste.**

Rêzika sazkirinê wiha ye:

<u>Serwer, dê, berlêker(bi)+raya(b)+ N.Kesa, seredanî.</u>

**- Rawa NEYÎNÎ:**

Bi karanîna alava (ne) tên çêkirin.

**Ezê <u>ne</u>bim mamoste.**

**Tu dê (tiwê) <u>ne</u>bî mamoste.**

**Ew dê (ewê) <u>ne</u>be mamoste.**

**Em(ê), hûn(ê), ew(ê) dê <u>ne</u>bin mamoste.**

**4.Fermanî**

**A**. Teşeya **-I-**.

**Tu jîr be!** **Hûn jîr bin!.**

Rêzika sazkirinê wiha ye:

<u>Serwer, seredanî, ra(b)+N.Kesan(e,in).</u>

**- Neyînî:**

Ew bi alîkariya daçeka neyîniyê (ne), çêdibe.

**Tu *ne* jîr be !.** **win jîr mebin !.**

**B**. Teşeya **- II-** : ( *berlêker "bi" distîne* ).

**Tu bibe jîr.      Hûn bibin jîr.**

Rêzika sazkirinê wiha ye:

Serwer, berlêker(bi)+ra(b)+N.Kesan (e,in), seredanî.

- **Neyînî:**

Ew bi alîkariya daçek (me) tê çêkirin, û şûna berlêker (bi) digire.

**Tu qels <u>me</u>be !.      Hûn qels <u>me</u>bin !.**

# NOD Û SÊ ÇEPKEGUL JI OSMAN SEBRÎ RE [1]

Xûşk û birayên xweşewîst! Şeva we hemiyan xweş be!

Li sereta, ez hevalên dilsoz, yên ku vê bîranîna nerxbuha diterxînin zor spas dikim, û herweha rêzdariya xwe jî, ji hemî beşdarên rûmetdar re didim xuya kirin, û silavên bînsicikî, ji zêytûn û axa Çiyayê Kurmênc digihînim we.

Belê Apo! Belê têkoşerê me Osman Sebrî. Em îşev, li nik we, di mala we de, dîsan mîvanên we ne, û em bi vê seredana taybetî, xwe gelekî serbilind dibînin.

Va ye, ez ji gulîstana evîn û gelparêziya mîvanên we nod û sê çepkegulan di guldana giyana pakrewanên dîlbera (welat) we de, bi

1. Gotina EBDILMECÎT ŞÊXO - Di şeva 93 saliya jidaykbûna Apo Osman Sebrî de hate xwendin, Kovara PIRS, Hejmar (13).

boneya roja jidayîkbûna we, ji hestiyên we yên bînxweş û nemir re pêşkêş dikim.

Erê Apê me!

Nizanim! Çawa emê îşev, di kurtedemekê de kanibin arwêna xwe li ser wane û fêrbûnên we yên ne yeksane û cure bi cur bidin, çimkî jiyana we samaneke zor dewlemend bû, û ew Kurdê ku wateya jiyana we nas neke, bila nebêje ez welatparêzekî ronakbîr im, û ewên ku bi wan tovên kurdparêziya we xwe av nedin, bila nebêjin, em niştimanperwer in û pêdar in.

Erê beşdarên berêz!

Eger jiyana Osman Sebrî ne mozexana ramanên têkel û sudar baya, ma navdarekî wek Prof. Qanatê Kurdo kanî bû bigota:

*((Li paş Cegerxwîn, şêrê serê çiyayê Kurdistanê, yê duhem Osman Sebrî ye ...)).*

Rast e Apo! Ne tu bû li ser parastin û vejîna zimanê me got:

*Bijîn kesên ji bo zimên dikin xebatê*
*Ew in berê gel diguhêzin riya felat*

Wî ji siyasetvanên Kurd re jî wiha digot:

*(( Eger rast hûn rêvebir û siyastvanên gelê xwe ne, xwe mebînin bavê milet, xwe bibînin kurê milet )).*

Bi rastî, eger em çiqas li dermafê Apê xwe, îşev bêjin, herdem hindike, lê ez dixwazim peyva xwe bi gotina Hemreş Reşo li ser Apo kuta bikim:

*((Ne bê diravî, ne bê malî, ne ketina zîndanê, ne biryarên dardekirinê, ne şandina Medxeşqerê, ne karbidestên Tirk, Ereb, Înglîz û Firensiyan kanî bûn vîna wî ya pola, baweriya wî ya xwenas bişkînin)).*

Ev e Apo! mêr e, mêrxas e, û şoreşgerê gelê xwe ye, ma gelo çima wê jê hez nekin…?? .

**RAHÊNAN li ser deqê**

1. *Teşe û durvên lêkera bûnê destnîşan bike.*
2. *Wateyên van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Mêrxas, karbidest, peyv, arwên, vejîn, vîn, têkel, sudar, tov, saman, bone, seredan, sereta, xweşewîst, gelparêz, têkoşer, herweha, rêzdar, guldan, çepkegul, giyan, diguhêze.**

**SPARTIN**

1. *Vê deqê bibe ser deftera xwe û ji nav bêjeyên wê şeş lêkerên bûnê bi (l), sê alavên neyîniyê bi (a), sê serweran bi (sr) û sê seredaniyan bi (sn) destnîşan bike.*

Ez şagirt im, tu şagirt î, ew jî şagirt e, em hemî şagirt in. Ez ji Efrînê me, tu ji Kobaniyê yî, ew jî ji Qamîşlo ye. Em ne Ereb in, ne Tirk in, ne jî Faris in. Em ji miletekî naskirî ne, ji gelê me re dibêjin Kurd. Em fêr zimanê xwe dibin. Zimanê me hebûna me ye, gava winda bibe, emê jî winda bibin. Lewre em ji dil de lê meqate ne, û ji ber ve dibin xwedî.

2. *Kînga daçeka neyîniyê dikeve pêşiya serwerê ?.*
3. *Van hevokan bibe deftera xwe, û dem û wateya lêkera bûnê li ber binivîse.*

| | |
|---|---|
| **- Ez jîr bim…** | **Ez bibim jîr…** |
| **- Tu ne evîndar bî …** | **Ew nebe evîndar…** |
| **- Emê jêhatî bin…** | **Hûn dê bibin navdar…** |
| **- Tu dê ne tirsok bî …** | **Ewê nebin xwefiroş…** |
| **- Tu hêmin be …** | **Hûn hêmin bin……** |
| **- Tu û wan ne har bin…** | |

# KESANDINA LÊKERÊN SAZBER

Lêkerên sazber (pêkhatî, hevdudanî û biwêjên lêkerî) li gor hêmana xwe ya lêkerî ya sade, yan têper yan jî têneper in. Weha jî, ew li gor rêzikên kesandina lêkerên sade yên têper û têneper têne kesandin.

**1. Lêkerên pêkhatî**

Di kesandinê de, ji ber ku her parçeyek bi serê xwe ne xwedî wateyeke temam e, ev lêker perçe nabe û bi hev ve tê nivîsandin.

**Min barê xwe hilgirt.**

**Em herdem ala aştiyê radikin.**

Taybetiyên kesandina lêkerên pêkhatî ev in:

**a.** Berlêkera (Bi) wernagirin:

Wek em dizanin, demên nihoya bilanî, wêbê, boriya berdest a bilanî, hekînî û fermanî bi alîkariya berlêkera (Bi) têne çêkirin. Lê lêkerên pêkhatî ji vê rêzikê der in; ew wê berlêkerê wernagirin.

**Hilgire ! … Hilgirin! … Ez hilgirim …Ezê hilgirim.**

**Ez hilgirtama … ( dê) ez hilgirtama.**

**b.** Berlêkera (Di) û daçekên neyîniyê dikevin navbera pêrkîtê û lêkera sade ya alîkar:

**Ez hildigrim … Ez hilnagirim.**

**Ez radibim … Ez ranabim.**

**Ez radibûm … Ez ranedibûm.**

**Ez rabû bûm … Ez ranebû bûm.**

**Rabe ! … Ramebe !**

## 2. Kesandina lêkerên hevdudanî û biwêjên lêkerî

Ev lêker, di raweya raderî û çêbiwar de bi hev ve tên nivîsandin.

*Rader* : Avdan, lihevkirin…

*Çêbiwar* : Avdayî, naskirî…

Lê di kesandinê de, tenê hîmê lêkerî têye kesandin, hêmanên ne lêkerî jî cihê têne nivîsandin.

***Nimûne:***

***Bihevketin:* Em *bi hev ketin.***

**Jibîrkirin: Memo tu caran Zîna xwe *ji bîr ne kir*.**

# LÊKERÊN RÊZDER

Lêkerên rêzder ew in ku, çêkirina raya wan ne li gor rêzikên naskrî ne. Lêkerên rêzder yên sereke ev in:

Vîn, Hebûn, Hatin, Herîn, Werîn.

Emê li vir li ser kesandina hinekan ji wan rawestin.

## Lêkera HEBÛN

***A*.Kesandina lêkera (HEBÛN) di demên borî de:**

Di van deman de, ew ji hêla derxistina raya lêkerê, wergirtina berlêker û nîşandekên kesan, mîna rêzkên resen yên wan deman tê kesandin.

**Nimûne li ser kesê yekê:**

**1. Boriya borî :** **Ez hebûm**.

**2.Boriya berdest a bilanî :** Berlêkera (bi) nastîne.

**Ez hebiwama (hebûyama, hebama, hebûma).**

**3. Hekînî**

**Ezê (ez dê) hebiwama (hebûyama, hebama, hebûma).**

**B. Di demên niho, wêbê û raweya fermanî de**

**1. Nihoya pêşkerî:**

**Ez heme.** **Em hene**

**2. Nihoya bilanî**: Berlêkera (bi) nastîn:

**Ez hebim**.

**3. Wêbê :**

**Ezê (ez dê) hebim**.

**4. Fermanî:**

**Tu hebe.**

**-** Teşeya **NEYÎNÎ** ya lêkera **HEBÛN:**

Neyîniya lêkera HEBÛN ji lêkerên (TUNE û BÛN) pêk tê**.**

**1. Neyîniya boriya borî:** **Ez tune bûm.**

**2.Neyîniya boriya berdest a bilanî:** **Ez tune biwama.**

**3. Neyîniya nihoya pêkerî:** **Ez tune me (nînim).**

**4.Neyîniya nihoya bilanî :** **Ez tune bim**.

**5. Neyîniya wêbêyê :** **Ez dê tune bim.**

# Lêkerên HERÎN Û WERÎN

Ev lêker tenê di demên niho, wêbê û raweya fermanî de tên bikaranîn. Rayên wan wihan e:

Herîn = Her. Werîn = Wer.

## 1. Fermanî:

***Herîn* : Tu here ! …Tu me̲re**

***Werîn* : Tu were! …Tu me̲yê (mê, metê)**

## 2. Nihoya pêşkerî

***Herîn :* Ez diherim (derim) ……Ez na̲rim.**

## 3. Wêbê

***Herîn :* Ez dê (ezê) herim ……Ezê ne̲rim.**

***Werîn* : Ez dê (ezê) werim.**

## 4. Nihoya bilanî

*Herîn:* **Bila ez herim……Bila ez ne̲rim.**

*Werîn:* **Bila ez werim**

- **Neyîniya** wêbê û nihoya bilanî ya lêkera WERÎN nîne, lêkera (HATIN) ciyê wê digre.

# Lêkera HATIN

Ev lêkera di demên niho,wêbê û raweya fermanî de rêzder e. Lewre jî, emê li vir li ser kesandina lêkera (**HATIN**) di demên niho, wêbê û raweya fermanî de rawestin.

Raya Lêkera HATIN ya demên niho, wêbê û raweya fermanî (ê) ye. Ew hem li ser bingeha wê rayê, hem jî li ser bingeha raya lêkera WERÎN tê kesandin.

**1. Nihoya pêşkerî**

**di(t) + ê + Nîşanên kesan**

**Ez Ditêm(têm) …… Ez nayêm(netêm).**

**2 . Nihoya domdar:**

**Ez tême …… Ez nayême.**

**3 . Nihoya bilanî:**

**Ez bêm (werim) …… Ez nayêm.**

**Bi(b) + ê + Nîşanên kesan**

**4. Wêbê:**

**Ezê (ez dê) bêm (werim)… Ez dê (ezê) neyêm.**

**5. Raweya fermanî:**

| | | |
|---|---|---|
| **Were...** | **newê** | **metê** |
| **Werin...** | **newên** | **metên,** |

# Lêkera VÎN (VIYAN , VÊTIN)

Lêkera VÎN di hemû deman de, mîna lêkera têper, li gor biresera xwe tê kesandin. Eger bireser di hevokê de tune be, ew herdem li gor kesê sisiyan yê yekejmar tê kesandin.

Lêkera VÎN, bi taybetî, di demên jêrîn de têye bikaranîn:

*Boriya nêzeçîrokî, nihoya pêşkerî û wêbê.*

## 1. Boriya nêzeçîrokî

**Min gul (gulek) diviya bû … Min gulek *ne* diviya bû.**

**Me gul (gulin) diviya bûn …Me gul *ne* diviya bû.**

## 2. Nihoya pêşkerî

**Ez gulê (gulekê) bivêm…Ez gulê navêm.**

**Em gulan (gulina) bivên… Em gulan navên.**

## 3. Wêbê

Pir hindik bi kar tê û hîngê wateya (gerek) e dide.

**Ezê gulê (gulekê) bivêm…Ezê gulê nevêm.**

**Ezê gulan (gulina) bivên… Ezê gulan nevên.**

## Darêja HATIN – KIRIN

Hin caran kirarê lêkerê ne diyar e, û di hevokê de nayê gotin.

**Ez hatim dîtin. Ew tê girtin. Em werin verêkirin.**

Ji vê darêjê re DARÊJA HATIN-KIRIN tê gotin. Di her du nimûnan de tê xuyakirin ku lêkera alîkar (hatin) li gor rêzikên lêkera têneper tê kesandin. Lêkera bingehîn jî di raweya raderî de dimîne.

***Nîmûne :*** **Diz hatin girtin. Diz hati bûn girtin.**

**Diz dê werin girtin.**

# SERHILDANÊN KURDAN[1] (1800-2000)

Di destpêka çerxa nozdan de, hesta netewî li Ewrupayê serî hildida, û gelên Ewrupayî xebat dikirin da ku dewletine yek netew û yek ziman ava bikin.

Li Rojhilata Navîn jî, dewleta Osmanî, gelek milet kiri bûn bin destê xwe û di nezaniyeke tarî de kor kiri bûn. Ew hest û ramanên netewî yên ku li Ewrupayê geş bû bûn, kenca xwe davêtin ser Rojhilata Navîn jî.

Gelê Kurd, ê ku Osmaniyan bi darê zorê zep kiri bû, hestên netewî li ba wî jî germ dibûn; di dilên hinek mîr û axayên Kurd de vîna serxwebûnê şîn dibû, wan jî dixwast bibin xwedî destlat û dewlet.

Ji wê demê de, bi dehan tevger, serhildan û şoreşên Kurdan rabûn û bi sed hezaran qurban hatin dan, lê mixabin Kurd bi ser ne ketin û hêviyên wan ên netewî li ser zemînê diketin .

[1]- Mihemed Ebdo Elî.

Em kanin tevger û raperînên sereke yên ku li Kurdistanê li dijî destlatên Osmanî û Sefewî rabûne, weha bijmêrin:

Serhildanên: Ebdirehmanê Baban li Silêmaniyê 1806an. Mihemed Paşayê Rewendozî 1810an. Îsmaîl Paşayê Behdînanî 1835an. Bedirxan Paşa 1848an. Ezdîn Şêr 1853an. Serhildana Dêrsim 1877-1878an . Lawên Bedirxan Paşa 1877- 1889an. Şêx Ubêdelayê Nihrî 1880yî. Tevgera Betlîsê 1913an. Şoreşa Şêx Mehmûmdê Hefîd 1919an. Tevgera Simko Axa 1922an. Şêx Seîd 1925an. Îhsan Nûrî Paşa li çiyayê Agrî 1927-1931an. Elî Riza li Dêrsimê 1937an. Barzan 1943an. Komara Mehabadê 1946an. Şoreşa Êlûlnê 1961ê. Kurdistana Îranê 1979an. Tevgera PKK 1984an.

Lê belê di nav serhildanên çerxa bistan de, tevgerên herî bi navûdeng, serhildanên Barzaniyan bûn. Wan ji destpêka sedsala bîstan de, ra 1943an, herdem tevgerên çekdar li dijî hêzên Înglîz û Îraqê rakirin. Di sala 1946an de jî, li dema Komara Mehabadê, Barzanî bi serokatiya

têkoşerê nemir Mistefa Barzanî ji Komarê re parêzvanên dilsoz bûn.

Piştî Komara Mehabadê têkçû, M.Barzanî ligel 500 şervan berê xwe da Sovyetistanê, û ra sala 1958an li wir ma. Di sala 1958an de, jiserkînûve vegerî Îraqê.

Gava destlata Îraqê ya wê hîngê li mafên Kurdan mikûr ne hat, Mistefa Barzanî, di sala 1961an de şoreşa Êlûnê rakir. Di şerê azadiyê de, pêşmergeyên Kurdistanê li dirêjahiya neh salan şerekî serkeftî kirin, hîngê dewleta Îraqê neçar bû lihevkirina 11ê avdara 1970yî mor bike, û li hinek mafên Kurdan mikûr were.

Piştî wê demê, her du destlatên Tehran û Bexdê Li 6ê Avdara Sala 1975an li Cezaîrê li hev kirin û şoreşa Êlûnê têk birin. Lê belê wê şoreşê bingeheke xurt ji raperîna avdara sala 1991ê re amade kiri bû, û herwiha hêviyên gelê Kurd hatin vejandin û dîsa geş bûn, û bi milyonan Kurd ji nû ve bi wê raperînê re adzad bûn.

## RAHÊNAN li ser deqê

*1. Nimûnan li ser kesandina lêkerên pêkhatî, hevdudanî û biwêjên lêkerî destnîşan bike.*

*2.Wateyên van bêjeyan nas bike û li ezber bike.*

**Mikûr, amade, destkeftin, têkçûn, bingeh, raperîn, serhildan, parêzvan.**

## SPARTIN

*1.Van lêkeran di dema boriya borî de binivîse, û teşeya neyînî jî bide zanîn.*

**Hatin, rabûn, hildan, avdan, jihevhezkirin.**

☼☼☺☼☼

# Bersivên rahênanên waneyên pirtûkê

## ELFEBÊYA KURDÎ

*1. Di van bêjeyan de, tîpên ( hûrek an girdek ) sererast bike:*

Azad , Çemê Efrînê, Gurê har , Lozan .

*2. Van valahiyan bi bêjeyên rast dagire:*

31, 23, dengdêr. pênc, nerim, sert. R,T,P,Ç,K

*3. Tîpên cêwîdeng ên nerm bi(N) û sert bi (S) di destpêka van bêjeyan de destnîşan bike:* S, S, S, N, S, S , N.

*4. Dengdêrên kin bi (K) û yên dirêj bi (D) di bêjeyên jêrin de destnîşan bike:*D, D, D, D.

*5. Vekîta rast ( R ) li ber dîne,û ya çewt jî serast bike:*

R, Yekîtiya, R.

*6. Şêweyên nivîsandina van bêjeyan bide nasîn:*

Kanîk, kaniyek. Tenek, teneyek, tenak. Çiyayên. Elfebiya.

.........................................................................

## KÎT Û BÊJE

*1. Van bêjeyan kît bi kît binivîse:*Da-ris-tan, tu, ji-hev-hez-ki-rin, di-xwend, bi-rê-ke-ta-ma, A-gir.

*2.Ji bêjeyên jêrîn, ên sade bi (S),ên pêkhatî bi (P), ên hevdudanî bi (H) û yên bargiranî bi (B) destnîşan bike.*

Hat(s), rûniştin(p), biserneketin(b), tembûrvan (p), dilsozî (b), hawar(s), vegijgijandin(b), dengbêj (h), lihevrûniştin (b).

.........................................................................

## VEQETANDEK

*1. Veqetandek, tiştekî ji nav tiştan vediqetîne û pêş me dike:*

- ger ew tişt yekejmar, nêrza û bîna be, bi *ê* tê veqetandin, û eger mêza be bi a tê veqetandin, û gelejmar be jî bi *ên* pêk tê.

- Lê di rewşa nebîna de, eger nav nêr be bi î û mê yan gelejmar be bi e tê veqetandin.

*2. Veqetandekê di van hevokan de bi cih bike.*

- Kolan , kuçe û avahiyên bajêr di sersalê de dixemilin.
- Dara mala cîranên me Tû ye, dara me jî Çinar e.
- Keçine kurd en xwende hatin.

.........................................................................................

## TEWANDIN

*5.Van valahiyan dagire:*

- Tewandin rewşeke kesandina navdêra ye.
- Navdêra yekejmar û nêrza, bi (î) tê tewandin. Lê eger tîpa (e) yan a di navdêra bîna de hebe, tewandin bi guhertina wan bi tîpa ê çêdibe.
- Navdêra *gelejmar* bi (an) tê tewandin, lê eger navdêr nebîna be, tewang bi(*a* )pêk tê.

*6. Ji nav van hevokan, tîpa (R) li ber ya* rast *dîne, ya çewt jî sererast bike û tewangê bide nasîn.*

R…Tu kîjan têxtî dixwazî?
Ez textekî ji dara *çinarê* divêm
Azad pirtûkan dikire.
Ew pirtûkina ên çi ne ?
Yek a zimên e.

R…Yek jî li ser dîrokê ye .
R…Pir baş e, pirtûkên ziman, dîrok û zaniyariyê mirov zanatir dikin.

.............................................................

## JIMARNAV

*2.Van jimarnavan verêse:*

Yek<u>î</u>, didu<u>yan</u>, deh<u>an</u>, bîst<u>an</u>, pênc<u>an</u>, heştê<u>yî</u>, hezar<u>î</u>, nîv<u>î</u>.

*3. Tewanga jimarnavan di van hevokan de biserî bike.*

Her sal bi *<u>hezaran</u>* Kurd welatê xwe berdidin, û li welatên biyanî dibin penaber. Di sala hezar û nehsed û nod û *şeş<u>an</u>* de, dora yanzdeh *<u>hezarî</u>* bar kirin, lê di sala du hezar û didu<u>ya</u>n de, ji car û *nîvek<u>î</u>* Kêmtir bû.

.....................................................

## CINAVÊN kesîn û şanîdanê

*1. Ji nav cinavên kesîn ên jêrîn, cinavên salt bi* (S), *ên tewandî bi (T) û yên kurtkirî bi(K) destnîşan bike:*

Ez-S, wan-T, tu-S, we-T, ew-S, me-T, em-T, (wî,wê-T, te-T, min-T, ( win,hûn -S, ê-K, xwe-K, (yek , hev-K, pê-K, lê-K, jê-K, tê-K.

*3. Cinava (ew) li gor van rewşan bitewîne:*

Yekejmara mêza *<u>wê</u>* Gelejmara nêrza *<u>wî</u>*

*4. Cinava (ev) di van rewşan de bitewîne :*

Yekejmara nêrza *<u>vî</u>* Gelejmara mêza *<u>vê</u>*

5.Du cinavên nîşankirinê yên pîvane hene <u>ew</u> û <u>ev</u>. Ev her du cinav mîna navdêra ku dinimûnin *<u>veqetandek</u>* û *<u>tewangê</u>* dibin.

6. Cinavên nîşankirinê yên qersene sisê ne, ew ji tevlîhevbûna cinavekî şanîdanê û *veqetandekê* pêk tên.

*7. Cinavên jêrîn di kîjan rewşê de ne, bide nasîn:*

Ewa: veqetandeka mêza, ewên: veqetandekA gelejmar, ewê: veqetandeka nêrza

*8 .Binyata van cinavên qersene binivîse:*

Yên: ewên. ya: ewa, yê:ewê.

*9. Van raweyan ji hev bişelîne û perçan bi nav bike:*

Vaya: eva han, waya: ewa han, evna: evên han, ewa: ewa han, ewna: ewên han, eva: eva han, ewa: ewa han.

.......................................................................

**Cinavên PIRSIYARKÎ, GIRÊKÎ (KU), ARZIYÊ, NEBINAVKIRÎ**

*3. Cihên vala dagire:*

Cinavên arziyê ji cinavekî Qersene ku tişt dinimûne, û cinavekî kesane ku xudiyên tiştan dinimîne, pêk tê.

*5. Di vê kurtedeqê de, kîjan (ku) cinav e, û kîjan pevgih e, di nav kevanan de binivîse.*

Gava min got ku (*pevgih*) ezê werim, ez xwediyê şora xwe me. Lê yê ku (*cinav*) got û ne hat, ew ne dilsoz e ku (*cinav*) ciyê baweriyê be.

.....................................................................

**RENGDÊR**

*1. Cihên vala dagire*

Rengdêrên *jimarînê* li pêş navdêran tên.

*3. Rengdêrên salixdanê bêjene neguhêrbar in, lewre ew tewangê û veqetandekê* nabin.

*5.Van rengdêran bi raweyên beramberkirinê yên di wanê de hatine binivîse.*

Rast : *rastir, rastirîn*. Ciwan *: ciwantir, ciwantirîn*

*6. Bêjeyên ji stûnê yekê li ber ên ji stûnê diduyê dîne, daku rengdêreke hevdudanî jê saz bibe:*

Xusar, kumsor, durû, pozbilind, destvala

..................................................

## HÊMANÊN LÊKERÊ

*2. Van valahiyan dagire:*

Lêker bi kes û *mêjera* xwe ve bi kirarê ve girêdayî ye. Eger kirar *geleimar* be, ew jî gelejmar e. Lê belê, ji rêzê der, lêkerê *têper* di dema borî de, ji aliyê durvê xwe ve bi *bireserê* ve girêdayî ye.

*4.Vekîta çewt ya van raderan serast bike, û ya rast jî (R) li ber dîne:*

Perçeperçekirin, hilhatin, rûniştin, jihevhezkirin, danstandin, ketin-R, sorkirin.

...........................................................................

## KESANDINA Lêkera têneper DI DEMÊN TOFA YEKÊ DE

1. Raya demên borî ji van raderan derîne.

Bezand, vekir, ma, jihevhezkir, nalî, veqetand.

*2. Van nîşanên kesan li ber demên wan dîne:*

- Boriya borî û B.Berdest: *IM, E, Î*
- B.Dûdar û B.Berdest a domdar*: IME, IYE, INE*
- B.Berdest a bilanî û B. Hekînî: *AMA, AYÎ, AYA, ANA*

*3.Nîşana her demeke lêkerê ji stûnê yekê li ber wateya wê ya rast dîne.*

a- B.Borî: ç…Karek di kurtedemeke boriyê ye navbirî de dihate kirin.
b- B. Berdest: d…Lavijê jî destnîşan dike.
c- B.Dûdar: a…Karek bûye û derbas bûye.
ç- B.Berdest a domdar: c…Kark berê bûye lê akama wî hîn heye.
d- B.Berdest a bilanî: e…Bûyîna karekî bi bûyîna karekî din ve girêdayî ye.
e- Boriya hekînî: b …Dirêjiya kirin û bûyînê di boriyê de xuyan dike.

*5.Teşeya neyînî ya demên borî, bikaranîna daçeka neyîniyê ne saz dibe.*

*6. Van lêkeran di teşeya neyîniyê de binivîse:*
Venekir, hilnegirtin, baneda, neçûya, bar ne kir, rûnenişt, ne dihat , li hev ne xistin, ne xwend.

.................................................................

**VEGUHASTINA LÊKERÊN TÊNEPER..**
**Di demên hevedudanî de**

*2 . Demên lêkerên van hevokan li bogirê binivîse.*
Hûn rabû bûn: Boriya çêrokî
Ez bi ser keti bim : Boriya bilanî
Tuyê windabû bî: Boriya bilanî
Ew keti bûyana: Boriya berdest a bilanî
Ezê keti bûyama: Boriya hekînî

.........................................................

**KESANDINA LÊKERAN**
**di demên niho, wêbê û raweya fermanî de**

*2. Nîşana dema lêkerê ji stûnê yekê, li ber wateya wê ya rast ji stûnê didiwan dîne.*

a- Nihoya pêşkerî: b…Karek niha dibe û kuta ne bûye.

b- N.dirêj : a…Karek di dema axaftinê de dibe.

c- N. bilanî: ç…Karek dê paşê were kirin.

ç- Wêbê: b…Kirina karekî di mandê de, bi bûyîneke din ve girêdayî ye.

*4. Van lêkeran di raweya fermanî de binivîse:*

Li şûn bimîne, vêkeve, bîne.

...................................................................

**KESANDINA LÊKERA (BÛN)**

**di demên tofa diduyê de (niho, wêbê û fermanî)**

*3. Van hevokan bibe deftera xwe, û dem û wateya lêkera bûnê li ber binivîse.*

- Ez jîr bim: Nihoya bilanî (bûyîn).
- Ez bibim jîr: Nihoya bilanî (guherîn)
- Tu ne evîndar bî: Nihoya bilanî (bûyîn- neyînî).
- Ew nebe evîndar Nihoya bilanî (guherîn- neyînî).
- Emê jêhatî bin (wêbê-bûyîn).
- Hûn dê bibin navdar(wêbê-guherîn).
- Tu dê ne tirsok bî(wêbê-bûyîn- neyînî) .
- Ewê nebin xwefiroş(wêbê-guherîn- neyînî).
- Tu hêmin be(fermanî).
- Hûn hêmin bin(fermanî).
- Tu û wan ne har bin( nihoya bilanî- neyînî).

..........................................................................

# FERHENGOK

## A

- **Arzî: Xwemalîn, têştê mera. Eng = possessive. الملكية**
- **Armanc : Daxwaza ku mirov dixawze bigihê û pêk wîne. Erebî=hedef.**
- **Awaz : Saz, mûzîk.**
- **Arwêne : Nêrîn, zanîn. Erebî= Tesewir.**
- **Amadekirin: Hazirkirin.**
- **Alav: Alet.**

## B

- **Bîna : Tê dîtin, naskiriye. Eng = Active.**
- **Bang : Gazîkirin, yek deng li yekî bike.**
- **Bargiranî : Bêjeyeke ji çend bêjeyan çêkirî, hevristî ye. Eng = Compound noun.**
- **Biresera nedurust : Ewê ku karê kirarê bi awakî neyekser û bi alîkariya daçekê derbasî ser dibe. Eng = intransitive verb. مفعول به غير صريح**
- **Boriya borî . Eng = past. الماضي**
- **Boriya dûdar. Eng = past composition. الماضي الإنشائ**
- **Boriya berdest : Eng = Incomplet past. الماضي الناقص**
- **Boriya berdest a domdar. Eng = Incomplete progressive past الماضي الناقص المستمر**

- **Boriya berdest a bilanî. Eng = In complete past for desire (unreal past). الماضي الناقص للتمني**
- **Boriya hekînî. Eng = Conditional past. الماضي الشرطي**
- **Boriya çêrokî. Eng = Past perfect. الماضي التام**
- **Boriya nêzeçêrokî. Eng = past perfect. الماضي التام التقريبي**
- **Boriya bilanî. Eng = Unreal past. الماضي للتمني**
- **Boriya çêrokî ya bilanî. Eng = Unreal past. الماضي التام للتمني**
- **Boriya hekînî. Eng = Conditional past. الماضي الشرطي**
- **Bajarvanî : Şaristanî, medeniyet.**
- **Bihane : Hicet, karek dikeve ber karek din. Erebî=Me'ne.**
- **Bêtar : Bûyereke pir giran û bi êş. Erebî=Karîse**
- **Bingeh : Binyat. binyata tiştek. Erebî=esasî.**
- **Bone : Ji bona îşekî, tiştekî. Erebî=minasebe.**
- **Bûyer : Bûyînek, kirinek, rûdawek.**
- **Bihecî : Mirina bi qehr û şewatê.**
- **Bêgidî : Ne baş, pîs, çepel.**
- **Bêjeya lêkerî : Kombêje, çend bêje bi hev dikevin, di raweya raderî de tên bikaranîn û bêjeke nû çêdibe, jê re kombêje yan biwêja lêkerî têgotin . Erebî=te'ibîr fi'ilî.**
- **Bêperwa : bê ku tiştekî yan sûdeke kesane ji ber karekî ve bixweze.**

- **Binesazî : Ji bingeha xwe de, ji çêkirin û sazkirina kokane de.**
- **Ber : Berê darekê, wek: berê mêwê tirî ye.**
- **Berpirsiyar : Karek di ustuî de ye, di ber de berpirsiyar e.**
- **Bihnok : (,).**

## C

- **Cinav : Pironav, bêjeyeke cihê navan digire. Eng = Pronoun. الضمير**
- **Coş : Dilgermî, karek ji dil de bê kirin. Erebî= hemaset.**
- **Cinava rajer : Eng = Reflexive pronoun. الضمير المنعكس**

## Ç

- **Çepkegul: Baqek yan gurzek gul.**
- **Çak : Jîr, jêhatî, livok.**
- **Çal: Kort, cihekî kolandî, berê genim jî dikirinê.**
- **Çêşme : Erq yan berbeq, di ser erdê yan di bin erdê re ye, ava malan ya qirêj tê re diherike.**
- **Çarçew : Dorçêwirme. Ji çar çov hatiye.**
- **Çawîrçîman : Geye û çawîra li çolê dibe.**
- **Çivane : tewandin, verês. Erebî= îmalê.**
- **Çavdêr : Çavê xwe li ser e, dibîne çi bi tiştekî yan îşekî dibe û nabe.**
- **Çêbiwar : Yê ku karek kirî. Erebî=esim fa’êl.**
- **Çespandin : Mêlagkirin, terixandin, tesbîtkitin.**

- **Raweya çêbiwar: Navdêra lêkerî û ya bireserî.**
**صيغة اسم الفاعل واسم المفعول.**

# D

- **Durust : Rast, doxri. Eng = True-correct. صحيح، صريح**
- **Dawîneya lêkerê : Kîta ku di kesandinê de bi dawiya lêkerê dikeve. Eng = Suffix.**
- **Delamet : kardayînê, stubarî, spartin. Erebî=wezîfe.**
- **Dîroknivîs : Mirovê ku bi zanîna dîrokê de mijûl dibe û li ser dinivîse.**
- **Darijtin, darêj : Çêkirin û lihevanîna bêjeyan. Erebî=siyaxe, sîxe.صياغة**
- **Dengdêr : Bideng, tîpên ku dengan didin. Eng = Vowels.**
- **Dengdar : Bêdeng, tîpên bê deng, bê alîkariya dengdêran deng jê dernayên.**
- **Deq : Komek bêje û hevok deqekê çêdikin. Eng = Passage-text. Erebî=nes.**
- **Daçek : Pêrbest, bernav, bêje ne li pêş navan tên û wan ditewînin. Eng = Preposition. Erebî= Herf cer.**
- **Destlat : Hukum, hêz û dezgehên dewleteкê.**
- **Dijwarî : Çetinahî, tiştê zor.**
- **Delamet : kardayîn, spartin. Erebî=wezîfe.**
- **Damezrandin : Avakirin, binyat danîn.**

- **Dorçarme : Dorçarma giravê av e. Her çar aliyên tiştekî.**
- **Destkeftin : Bi dest ket, xwe bigihîne tiştekî û bi dest xwe ve wîne.**
- **Diguhêze : Diguhêre, guhertin.**
- **Dilewer : Dil xurt, xudanê dilê xut.**
- **Destan : Çêrok û stiranên dirêj û bi wate.**
- **Destek : Komîte, heyet.**
- **Durv : Reng, teşe û çilobûna tiştekî .Erebî=Şekil.**

## E

- **Encam : Encama keyandina dêw rûn e. Erebî=netîce.**
- **Endam : Tiştek bi komek tiştên din ve girêdayî be.**
- **Enirî : Qiherî, di xwe de dişewite.**
- **Ezbenî : rêzdarê min, ez hazirim li ber destê te me, di xizmeta te de me.**

## Ê

- **Êvirs : Dareke çiyayî ye li çiyayê Kurmênc (Efrîn) pir heye, bi bejina xwe ya şêrîn tê nas kirin.**

## F

- **Fermanî: Emir û biryardan. Eng= Imperative.**
- **Fêrkirin, fêrbûn : Hînbûn,xwezanekirin.**
- **Fermo : Kermke, bûrin.**

## G

- **Gerdûn : Jiyan , dinya.**

- **Gorbuhişt : Ji miriyê cinetî re tê gotin.**
- **Gihanek : Kîtek e, bêje û hevokan digihîn hev. العطف، التوصيل**
- **Girdek : Tîpên girs û mezin . Eng=Capital letters.**
- **Gewre : Mezin , bi navûdeng.**
- **Giyan : Can, rihê Jindarekî.**
- **Giyanewer : Bi can û rih.**
- **Gelparêz : Ji gelê xwe hez dike û wî diparêze.**
- **Guldan : Şûşê ku gulan dikinê.**
- **Girîng : Cotkirin ji daran re girîng e. Erebî=Mihîm.**
- **Guftûgo : Hevpeyvîn, axaftina di navbera du aliyan de.**
- **Gelejmar : Bêtirî yekî.**
- **Girêkî : Pevgih, navgîn. Erebî=tewsîl.**
- **Guvde : Can û laşê mirov.**

## H

- **Hevok : Çend bêjeyên bihevketî. Erebî=cumle.**
- **Hoker : Zaraweke rêzimên e, pê cih û dem û rewş tê zanîn. Eng = Adverb. ظرف**
- **Hûrek : Tîpên hûrik, çûçik. Eng = Small letters.**
- **Hêman, hêvan : Kirde, endamê tiştekî. Erebî=unsur. Eng = Element. Erebî=Unsur.**
- **Hêmin, hêmen : Ker, bê deng, piştî dermên êşek hêmin dibe …**
- **Hoz : Ezbet, Komek mal û malbat hozekê çêdikin. Erebî=Eşîre.**

- **Heyber : Tiştê ku heye, çi bi çavan tê dîtin, çi bi hikarî û şopa wî tê naskirin. Erebî=mewcûd.**
- **Helwest : Bi tiştekî yan ramanekê bigire pê bike û jê danegere, jê re helwest tê gotin.**
- **Helbestvan : Hozan, helbestan çêdike. Erebî=şa'ir.**
- **Hestiyar, hest : Filan xudî hesteke tenike, tiştê ku dil pê dihese. Erebî=his.**
- **Herweha : Bi vî rengî, bi wî tonî, wergî, wilo…**
- **Hêvîdar : Xudan hêvî, bi hêvî ye, bi omdî ye.**
- **Hawîrdor, hawîr : Derdor, dorçarme. Erebî= bî'et.**
- **Havîngeh, havînî : Cihên bilind, heyam xweş û bayê hênik, mirov havînî diçe lê rûdine û digere.**
- **Hevkar : Karên mîna hev dikin, hevalên karekî.**
- **Hevalbend : Bi peymanan bi hev ve girêday ne, li pişta hev in.**

## J

- **Jivirûhade : Ji vir û hade.**
- **Jimarnav : Navên jimartinê, yek, du … Eng = Countable noun.**
- **Jînenîgarî : Çêroka jiyana mirovekî.**
- **Jîndar : Tiştên giyan tê de hene û dijîn.**

## K

- **Kirar : Yê ku karekî, îşekî dike. Eng =subject.فاعل**

- **Kombêje : Çend bêje bihev dikevin, di raweya raderî de bêjeke nû çêdikin, jê re kombêje yan biwêja lêkerî tê gotin. Erebî=te'ibîr fi'ilî.**
- **Karbidest : Yê kar û barê dewletê bi dest de ye, û kane biryaran bistîne.**
- **Kirên neyêr : Karên ku neyarek dike.**
- **Kavil : Wêrankirin, kambax, xirab.**
- **Kolan : Riyên nava bajêr.**
- **Kurkê şivên : Çileke stûr e , ji kulêv (hiriyê) çêdibe, şivan li xwe dikin.**
- **Kuçe : Birek yan perçek ji bajêr.**
- **Kovar : Pirtûkeke, gotaran belav dike.**
- **Kelepûr : Tiştên wêjeyî û çandeyî ku ji bav û kalan de ma ye.**
- **Kambax :Kavil, xirabe**
- **Katjimêr : Demjimêr, si'et.**
- **Komcivîn : Glek mirov li hev dicivin û li ser tiştina deng dikin.**
- **Kerole: Tilûrek e, li nav daristanên kurdaxê dijî.**
- **Kenc : Wek nimûne: Gava tiliya mirov kul dibe giliyên ber ranê wî glok dibin, ji rûdawê re dibêjin kenc. Erebî=in'îkas.**

## L

- **Lêker: Zaraweke rêzmanî ye, karekî dide nasîn. Eng = Verb. فعل**
- **Li nik : Li cem, li ba, li rex…**
- **Lebt : Liv, tevger.**

- **Lêkanî : Li hev anî, çêkir, rist, pêkanî.**
- **Lozan : Bajarekî li swêsrayê ye.**
- **Lûs: Cih, cîgeh.**

## M

- **Mêjer: Zaraweke rêzmên e, pê çêre jimara tiştekî tê kirin.**
- **Mikûr : Lixwenan, tiştek hebe û tu li xwe nî ku heye û pê bikî. Erebî=I'itîraf.**
- **Mindal : Zarok.**
- **Kadîn : Cihê ku kayê dikinê.**
- **Matnîşan: (!), Seyrnîşan, gav mirov tiştekî ne heroyî (adî). dibîne mat dibe, di nivîsandinê de bi nîşandekê tê naskirin.**
- **Mand : Paşeroj, wêbê. Erebî=misteqbel.**
- **Mixabin: Poşman im, li xwe sar bûme, lêborînê dixwezim.**
- **Miqate, miqyat, miqayît : Guh bidinê, lê binêrin, bila çavê we lê be…**
- **Morkirin: Li ser tiştekî erê bikî, wî bipejrînî û mora bi navê xwe neqişkirî li bin dînî.**
- **Mêrxas, mêrxaz : mirovê ku ji mirovtiyê hez dike û xêrxwezê e.**

## N

- **Nihoya bilanî.Eng =Presnt for desire. الحاضر للتمني**
- **Nependî : Ne nas. Eng = Unknown.**

- **Nebîna : Netê dîtin, netê nasîn, nediyar. Eng = Passive. Erebî=Mechûl.**
- **Nihoya pêşkerî : Eng =present. الحاضر للدلالة**
- **Nihoya domdar. Eng=presnt progrssiue. الحاضر المستمر**
- **Nasname : Tiştê ku mirov yan gel pê tên naskirin.**
- **Nependî : Ne naskirî, nediyar.**
- **Nemir : Ne miriye, zindiye, navûdengê wî li jiyanê maye.**
- **Navend : Navik, orta tiştekî, ji tiştekî re bibe navik yan ort û navend.**
- **Netewî, netewe : Miletî, Milî, gelî. erebî= Qewmî.**
- **Nêrevan: Yê ku tiştek bi çavê xwe dîtiye û li ser şahîd e.**
- **Navgîn : Du tiştan, du deveran digihîne hev.**
- **Lawir : Nawir, dewar, tebe. Erebî=heywan.**
- **Nûner : Temsîlcî, yek şûna yekî yan hinekan digre û ji ber wan ve deng dike, ew nûnertiyê wan dike.**

## P

- **Pevgih : Pêwend, du tiştan digihîne hev û bi hev ve girê dide. Eng = Conjunction. العطف التوصيل**
- **Pirtik : Kîtin ne ji guvdê bêjeyê ne, bi pêşî yan paşiya wan dikevin û wan diguhêrin. Eng = Syllabels . مقاطع ملحقة**
- **Pêrkît : Pirtikên ku bi pêşiya bêjeyê dikevin. Eng = Prefix. Erebî= Sewabêq.**

- **Parkît : Pirtikên ku bi paşiya bêjeyê dikevin. Eng = Suffix. Erebî=Lewahêq.**
- **Pêwand: Pevgih, bêjan digihînin hev û bi hev ve girê didin.Eng = Connectine. علاقة**
- **Parêzvan : Mirovê ku parêzvaniyê dike, tiştekî ji tiştekî diparêze û destê xwe di ser re digire.**
- **Pendî : Naskirî, hatiye zanîn.**
- **Perwerde : Fêrkirin, dazanîn.**
- **Parastin : Tiştekî dike bin çavê xwe û lê miqate dibe.**
- **Pêşwazî : Çû pêşiyê jê re got li ser û çavan tu hatî.**
- **Pispor : Mirovê ku di karekî de pir zana be.**
- **Parmistin : Bi desta tê pelandin û tê dîtin, yek tiştekî di tûrekî de parmist dike.**
- **Pakrewan : Xudanê giyanê pak, ji miriyên nirxbiha re tê gotin. Erebî=Şehîd.**
- **Pêçek: Cil û paçên ku zaroyên biçûk pê dipêçin.**
- **Pergal: Reng, teşe, rabûrûniştin, benz, heyeta tiştekî yan mirovekî.**
- **Pêşesazî : Hatiye çêkirin. Erebî=sîna'î.**
- **Pirsgirêk : Asteng, tiştekî ku çarek jê re gerek be.**
- **Peyv : Şor, gotin, bêje, wişe.**
- **Pol : Sefê şagirtan li dibistanê.**
- **Perçiqandin : Eciqandin, diperçiqîne, avê yan tiştekî ron jê dertînin, çav diperçiqin, milet jî têne perçiqandin.**
- **Pêwîst : Pêdvî pê heye, zor giring e, pir gerek dibe, bê wê nabe.**

- **Piyal : Kas, qedeh.**
- **Pejirandin: Li ser erê kirin, qebûl kirin.**
- **Pêt : Kizotê êgir.**
- **Pêşrew: Yê li pêş diçe, dimeşe, kar dike, yê zanatir, di pêş hemiyan de.**
- **Pirs : Yek pirsekê bike, doz, kêşe, mesele.**
- **Pêwendî: Têkilî, pevgirêdana yekî bi yekî re, yan çendan bi hev ve.**
- **Peyman : Sozekî morkirî di nav çend mirovan, dewletan yan aliyan de.**
- **Perzer: Tilûrekî biçûke, jê re Çûkî Zer jî tê gotin.**
- **Pêkhatî: çêkirî, darijî.**

## Q

- **Qad : Tebeqe. Ev avahî sê qad in, ango sê tebeqe ne.**
- **Qedexe : Yasaq, nahêlin bê kirin, ne serbest e.**
- **Qersene: Pêgeh, pêwendî, curek cinavên nişankirinê ye. Erebî=isim meusûl.**

## R

- **Rader : Makder, jêder, kok û binyat, kanî makdera avê ye. Eng=Origin. Erebî=Mesder.**
- **Raya lêker : Beşê lêker yê kokane, koka lêkerê. Eng = Infinitive.**
- **Razber : Tiştên ku bi cavan ne tên dîtin, bi hiş têne nasîn, mîna : Hiş, evîn…Eng =meaning ful. معنوي**

- **Rengdêr: Salix, rewş û rengên tiştan. Eng = Adjective. Erebî=sîfe.**
- **Raperîn: Serhildan û tevgerên siyasî yan civakî…**
- **Rêzdar: Mirovê bi rêz, yan bi rû û xudî nav û qedr û qîmet.**
- **Ronak: Stêrkên ku ji ezmên dirijên.**
- **Ronakbîr : Rewşenbîr, mirovê ku bi raman û hişê xwe dixebite.**
- **Rewş : Ew sêfîl e û nexweş e, yanê rewşa wî ne baş e. Erebî= hal.**
- **Raman : Pûnijîn, karê ku ji mêjî derdikeve. Erebî=fikir.**
- **Rûmet : Qedir , qîmet, keramet.**
- **Rajer: Bîrdar, serbixwe, xweveger. Erebî=mun'ekês.**
- **Rahênan : Hînker. Eng = Exercise. Erebî=Temrîn, tedrîb.**
- **Rawe : Durv û teşeya bêjeyekê. Eng = Mood. Erebî=sîxe.**
- **Rêzder : Nebiservehatî, ji rêzê der, ne li gor rêzika ku tê nasîn e. Erebî=şaz.**
- **Rewa : Bi destûr, bi rêdan, mikûrkirî,. Erebî=Meşrû'i.**

## S

- **Serhildan : Raperîn, şoreşe û tevger.**
- **Spartin : Kardayîn, delamet, karek kete ustu. Eng = Home work. Erebî=Wezîfe.**

- **Spas : Gava yek ji yekî kêfxweş dibe jê re spas yan spasdar im dibêje. : Erebî=Şukur.**
- **Sudar : Bi havil, bi berhemên rind , bi fêde.**
- **Seredan : Çûndina ba mirovan, hevalan, ser nexweşan .**
- **Sereta : Destpêk, li destpêkê.**
- **Serpilik : Serdefter, bi nav û nîşan.**
- **Setem : Zulm û zor.**
- **Spehî : Rind, şêrîn, ciwan, çeleng.**
- **Serkeftin : Di karekî de bi ser keve, bi pêşkeve, bigihê armanca xwe.**
- **Sermiyan : Tişt an pere mirov dikane pê dewlemend bibe . Erebî=Rismal.**
- **Silogan: Diruşm. Diruşma Barzaniyê nemir ev bû: ((Yan Kurdistan yan neman)).**
- **Sereke : Ji yên di ser gişan re, yê li pêş, li jor.**
- **Serwer : Navê tiştekî, kirarekî, li destpêka hevokê tê. Eng = Noun. الاسم**
- **Seredanî : Salix û xebera navekî, bi serwer û lêkerê bûnê re tê. الخبر**
- **Sêvir : Bajarekî li swêsrayê ye.**
- **Salix : Rewş, wî riya mala xwe salix da. Erebî= sîfe.**

## Ş

- **Şermezarî : Fedîkirin, riswabûn, çepelbûn, pîsbûn.**
- **Şênî: Hinek ji gel, ji xelkê, mirovine pir, şêniyê gundekî.**

- **Şagirt : Qutabî, xwendekarên dibistanê.**
- **Şaliyar : Wezîr.**
- **Şevbêrk: Rûniştinên hêvarê digel mirov û hevalan.**
- **Saman: Sermiyan, xezîne, rismal.**
- **Şop: Rêç, rêka tiştekî yan kesekî.**
- **Şehrezayî : Pêşketî, şaristanî,bajarvanî, medenî.**
- **Şênber : Tiştê bi çavan tê dîtin, û destan tê parmistin, pelandin, bervajî rezber. Erebî = madî.**
- **Şêwe : Reng, teşe. Erebî = islûb.**

## T

- **Tewandin : Verês, civane, di vê rewşê, bêje pergala xwe diguhêre û çivan dide xwe. إمالة**
- **Têper: lêkera ku kirarê xwe durust e, bê daçek e. Yanê karê kirarekî yekser diçe ser bireserekî. Eng =Transitive verb. الفعل المتعدي .**
- **Têneper: Lêkera ku biresera xwe nedurust e. Yanê karê kirarekê yekser naçe ser bireserekê. الفعل اللازم.**
- **Tov: Tova gênim, genmê ku dibe bidar û tê çandin.**
- **Tof: Komek yan govek tiştên ji cineskî mîna hev in.**
- **Têkoşer: Xebatker, yê cefê dibîne.**
- **Term : Guvdê mirî, laşe.**
- **Terixandin: Mêlagkirin, bicîkirin, tesbîtkirin, ketina dîrokê.**
- **Texlît : Cure, reng, ton….**

- **Têkilhev : Ketiye nav hev, tevlîhev bûye.**
- **Teşe: Pergal,durv.Çi teşey e? yanê çi şekil û bejin e.**
- **Temen : Salên ku mirov li jiyanê dijî.**
- **Têgihêştin: Ez ji te têgihîştim, yanê min ji te fam kir.**
- **Tilûr : Teyr, lawirên ku difirin.**
- **Têkçûn : Bi serî ne bû, ber avêt, bi ser neket.**
- **Tixûb : Sînor, taximê tiştekî.**
- **Taybetmendî : Firîn ji taybetmendiya tilûra ye. Erebî=xisûsî.**
- **Tika : Lave, berger.**

## U

- **Ustubarî:Tiştê di ustuyê yekî de be,û qisaweta wî be.**

## Û

**………………………..**

## V

- **Veqetandek : Zêder, danasîn, tiştekî ji nav tiştan vediqetîn û dide nasîn. Eng = Article. تعريف**
- **Vekît : Rênivîs, rastnivîsandina bêjeyan. Eng = Dictation. إملاء**
- **Vegirtin : Dagîrkirin, zepkirina tiştekî bi zorê. Ew wateya (aşla zarokan), yan yek nexweşiyekê ji yekî vegre jî dide.**

- **Vîn : Daxwez, bawerî û dilxweziya mirov. Erebî=îrade.**
- **Vejandin, vejîn: Ji nû ve xweşkirin, rakirina ji mirinê.**
- **Verês : Tewandîn. Erebî=îmalê.**

## W

- **Wêbê : Mand, paşeroj, rojên wê bên. Eng = future.**

- **Wêbêya berdest. Eng= Incomplete future. المستقبل الناقص**
- **Wirdek : Deqiqe.**
- **Welatî: Mirovên ku di welatekî de dijîn tev welatiyên wî welatî ne.**
- **Wate: Tiştê ku ji gotinekê yan bêjeyekê tê naskirin û têgihîştin. Erebî=Me'ine.**

## X

- **Xişm : Bêtar, bûyera giran û bi ziyan.**
- **Xweşewîst : Ezîz, hêja, giranbiha.**
- **Xêz : Xet.**
- **Xuşav: Xwarineke ji kelandina mûjên bê dendik çêdikin.**
- **Xweser : Biserê xwe ye.**
- **Xweza : Sirûşt, xwerist. Erebî=tebî'e.**
- **Xwemalîn: Arzî, têştê mera. Erebî=milk.**
- **Yekejmar : Tek, yek.**

# Z

- **Zarawe: Navê tiştekî, wek: Lêker, navdêr, tîpên girdek… Eng=Têrm. مصطلح**
- **Zayend: Nêr û mihêtiya jîndaran. Erebî=Cins.**
- **Zordar : Setemkar, zalim.**
- **Zemîn : Erd, xak.**

# NAVEROK


DIYARÎ 3
PÊŞGOTIN 5
ELFEBE 7
KÎT û BÊJE 14
NAVDÊR 24
VEQETANDEK 32
TEWANDIN 38
JIMARNAV 45
CINAV 51
CINAVÊN: PIRSIYARKÎ, PEVGIH (KU), XWEMALÎN(ARZÎ), NEBINAVKIRÎ.
RENGDÊR 67
HOKER. GIHANEK. DAÇEK. BANG. 73
LÊKER 80
HÊMANÊN LÊKERÊ 87
KESANDINA LÊKERÊ 95
KESANDINA LÊKERÊN TÊPER DI DEMÊN:
-BORÎ DE 96
-NIHO, WÊBÊ Û RAWEYA FERMANÎ DE 115
KESANDINA LÊKERÊ (BÛN) DI DEMÊN NIHO, WÊBÊ Û RAWEYA FERMANÎ DE 125
KESANDINA LÊKERÊN TÊNEPER 133
KESANDINA LÊKERÊN TÊPER, SAZBER, RÊZDER, HERÎN û WERÎN, HATIN- KIRIN 137
BERSIV 150
FERHENGOK 157

===============

**Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024.Z-2636 . K de, hate weşandin**

**www.yek-dem.net**

**info@yek-dem.net**

